

têgehên me neyar in
hêviyên me xav in
rondikên me beyar in
zengelorên me yên pêxwas
ji çiyayên xemên me re
newal in
çendîn kendavên xemgîniyê
li ber çavên sermayan
xwar in
hêsir strih in
pelên me yên lerzok şil in
hinavên wan sar in

Rêber Hebûn

Helbest

Qêrînên roniyê



RÊBER HEBÛN

# QÊRÎNÊN RONIYÊ

HELBEST

# Qêrînên roniyê

## Helbest

## Rêber Hebûn

*Çapa duyem: Çapxaneya Sersera 2019*

*Amedekirina wêneya bergê: Yehya Silo*

*Navê pirtûkê:Qêrînên roniyê*

*Daner: Rêber Hebûn*

*Cure :Helbest*

*Hijmarkirina navnetewî: ISBN 978-3-96640-073-2*

*Mafê çapê parastî ye, ne ji mafê tu sazî an kesayetan e ku bêyî agahiya nivîskar vê pirtûkê çap bike.*

*Sersera ( Dr. Med. Bashar Moustafa)*

*www. Sersera.com*

**Diyarî**

**Ji -HEBÛN- re**

**Rastiya bedew û  a bi rûmet**

**ji jiyana min re**
**bingeha yekbar**

**ji bîr û maf û xaka bedew re**

# PÊŞGOTİN

**Berî ku hest bibin best di nava hişên helbestvanekî de, ew bi tîna agirê helwestan tên pijandin. Di her risteke helbestvanekî de, bêguman tîna germahiya hevrikîyeke hestan heye. Helbestvan bi peyvên xwe ye şîrîn û nazik, dixweze ew helwestên ku di nava dilê civakê dijenin, bike besteke nû, û bi gotinên xwe re bigihîne me. Em wekî xwênerên van hest û bestên helbestvanan, bi hêsanî karin rewşa heyî û helwestên nivîskaran, li ser rûpelên sipî de, bixûnin û hêza hinirên wan bibînin. Hesta ku di nava hişên helbestvan de ye, mîna hevîrekî ter e, li gorî her teşe û cureyî tê badan, lê dema ku bi bestan tê strandin dibe helwestek xwedan hebûn**
**di van dehsalên dawîyê de, di nava civaka me de, bi taybet li Rojavayê welêt de, komek helbestvanên ciwan mîna siwarên li ser pişta hespên rewan li meydana cirîdê ketin pêşbirka bezê. Her çiqas meydan fereh û rê dirêj be, şîyan û hunerên siwaran di dûmahîka cirîdê de, dîyar dibin. Helbestvan RÊBER HEBÛN, yek ji van siwarên serkêş e ku ala helbesta kurdî bilind hildaye jor û di nav siwarên pêşîn de ji dûr ve dîyar e helbestvan Rêber Hebûn, bi rêya vê berhema xwe ya dibin sernavê QÊRÎNÊN RONÎYÊ de, dixweze bûyerên ku li welatê me diqewimîn, bike wêneyeke zindî û nîşanî me bide.**
**Di nava helbestên wî de, sê konên bilind ku her yek ji wan konan bi stûneke qalind hatiye hildan heye.**
**Di her konekî de gelek dîmenên ciwan ku bi rengên çeleng hatine niqişandin hene.**
**Di wêneyên konê pêşîn de, nivîskar bi destê hişên te digre û ligel xwe te jî noqî nav derya dîrokê dike. Ew qirtikê birînên ku ji dema sedsala Ehmedê Xanî de kêm girtî, tevradike.**
**Ew gelek pend û tembeyên Xanî jî, ji te re dûbare dike.**

**Di nava konê din de, helbestvan hişên me wekî bazekî li seranserî welêt de , li nawal û gelîyan, li çîya û baniyan, li gund û bajaran digerîne. Ji xwe konê dawiyê mişte ji wêneyên evîn û evîndaran. Li ber her wêneyekê, mirov neçar dibe ku çend caran lê tameşe bike.**

**Çavên mirov ji dêdara wan têr nabin. Her yek ji wan çîrokeke zindî ye, bûyer wekî livên tizbîyan ,li pê hev tê de ,rêzkirî ne**

**helbestvan Rêber Hebûn, di vê berhema xwe ye nû de, pêşengeheke wêneyan nîşanî me dide. Em li wêneyan tameşe dikin xwe di wan wêneyên li ser rûpelên sipî hatî nivîsîn de dibînin.Dibe ku hinek ji me li şûna xwe kesekî din bibînin, yan li xwe binêrin xwe nenasin; ji ber em di welatekî xwînî de vejîn û mezin bûn e, derd û kulên me ji hev ne dûr in**

**ev koma hestan ya ku heya niha xwe di quncikê hişên nivîskar de civandibûn, her didan qêran û dixwestin ku ronîyê bibînin ta ku xwe bigihîne me. Ji niha û şûn ve, ew êdî qêrên zindî ne.**

**Wê bi rêya van rûpelan û wêneyên ciwan de,bibin mîvanê malên me.**

**Mala nivîsakar û helbestvan Rêber Hebûn ava be ku em jî ,kirin hevparê van hestên lihevhatî û dîmenên ciwan**

**Mehmûd Hesen Berazî**
**25/12/2019**

## Hebûna Min

**Di jiyana herî winda**

**li nav ezmanê çavê te**

**dibûm ew hêsir û ew viyan**

**li ser sînga te gerden bûm**

**bi ramanê xwe yê dilzar**

**dilên ewran dirêxînim**

**di meyxana gulên çiyan**

**sîtava te dinoşîn im**

**bi hêvî me bi dilşadî**

**evîna me bijî her dem**

**evîna me bibe efsan**

## Evîn

**Gula sora li serê çiyan**

**ji ber te ez birîndar im**

**birîn bû kaniyek zêrîn**

**nivîsand axînê baran**

**de zû barke şeva axîn**

**bihêle vî dilî xemgîn**

**bi rengê perwînên hêvî**

**difiriyam li nav Gulîzaran**

## Cejina min

**Li ser tiliyên te dibare**

**berfa Havîna birîn**

**lêvê ezmanê bilind**

**maç dikir te mîna dîn**

**hilma canê te ji baxê**

**zeyzefûna dilbirîn**

**xewna min bir**

**awirên çavê te yarê**

**ava jîn**

**çû bi bayê Payîzê me**

**her kovan û êş û kîn**

**li ber dîwarê xemgîniyê**

**her dinale dara şîn**

**bariya agir li giyan**

**mîna hêsrên dil bi xwîn**

**heyv xwe hilda**

**li ser çiyayê sînga te**

**keça evîn**

**li ser keziyên te**

**kulîlkên xemrevînê çilmisîn**

**nalînek ket di nav şeva dûrbûna te**

**Surgûna min**

**destnîşana kamîranî**

**Xewşecanî**

**jîna min**

**tu hebûnî**

**zanebûnî**

**tu evînî**

**Cejina min**

# Vîna nemir

**Bûm ji ber te mîna warê bê xwedî**

**dil disoje**

**her du çavên min girî**

**dûrbûna te rastiya zora felek**

**tev bû axîn**

**li ser dilê min gindirî**

**li ser kenarê sîngê te pir tî me ez**

**herdû memikên te dinoşim**

**wek tirî**

**herdû lêvên te ji hingiv derketin**

**lê ziravê**

**xemrevînê**

**Sorperî**

**te dibînim mîna berfa li ser çiyan**

**Sorgula "Sîpan" û "Cûdî" û "Agirî**

**efyûna min lê vîyana baxê min**

**çêke şahî bilbila min**

**tu perî**

**jîna min tu**

**mîra gerdûna bedew**

**Zîna min tu**

**sozê me qet namirî**

## Xewin

**Xewina min tu**

**dîlbera min**

**sorgula robar û deştan**

**xweşevîna min tu yarê**

**şahiya aheng û cejinan**

**tu dîrokek tê di xwendin**

**lê Hebûna jîna gelan**

**distire bilbil li ber min**

**dengê wî awaza cengan**

**ev buhara azadiyê**

**bû goristana zarokan**

**yarê, bêdengê tu kanî**

**mayî koçber dîla konan**

**awirên te awaza vîn**

**rondikên çavên te baran**

**sîngê te deryaya şîrîn**

**aşitî danî li cîhan**

**li ber wê ez pir mest û gêj im**

**radikir wêneya ezman**

**herdû sêvên te lehî ne**

**şînkirin perwer li jiyan**

**em ji hev re bûn e demsal**

**bûn e havîn û zivistan**

**tu giyana Rojava yî**

**"Efrîn" û "Dêrik" û "Koban"**

**tu zemînê dildariyê**

**asîmana ewr û çûkan**

# Ji bo vê jînê

**Di dil de tu mayî**

**mîna hest û damar**

**di gewdehê min**

**tu ferhenga jîna bi jar û pepûk**

**di bajarê min**

**belê her gulek sor**

**di buxçeyê bejina te**

**digrî ji bo min**

**di lêvên te de**

**ew xunava reben**

**her dixwîne sirûd**

**bi maçên revok**

**li ser sîngê te**

**ez diçînim evîn**

**ji bo paşeroja hemî bilbilan**

**ku werin warê min**

**ji bo bar bikin**

**ew neyarên qirêj**

**ji Rojava me**

**ji bo her bijî**

**ken û şahî û dîlan**

**ez e mîna tembûrê**

**bidim awaza xwe**

**li her şax û şar**

**ez e şêwe kim**

**kenê zîz û niyaz**

**di lêvên zûha de**

**nema berdidim**

**ev viyana bedew**

**di nav kavilan de**

**dibînim welatek**

**bi nirx û bi bîr**

**her dinoşîne tirsê**

**ez û tu ligel hev**

**nivîsên evînî dikin mêrg û bax**

**ji bo her bimînin sirûd û huner**

**ji bo afirîner**

## Gor

**desthilatek diçe**

**û yek tê**

**darbest li kolanan digere**

**peyker di cihê xwe de ma**

**kerî qûnên xwe hildidan berve jor**

**welat bûye gor**

# Bahoz

**Di nav pirsên tenik de**

**dixwazim cesareta bahozê bistînim**

**kevokên sîngê te bidizim**

**di cîhaneke serbest de**

**li navendeke sereke**

**di bilindahiya memikên te de**

**gerestêrkan diafirînim**

**li ser bilindahiya memikên te**

**wêneyên bedewbûnê digrim**

**li ber şîroveyên mij**

**û gengeşiyên bayê zer**

**pirsên gula winda dibin**

**seqem tovên zuhabûnê diçîne**

**lê her germbûna lêvên te**

**çalakiyan li ser lêvên min**

**li dardixîne**

## Buhara Kurdî

**Îro xewna kurdî ji nav teht û kavil**

**dîsa jîn dibe**

**li başûrê şehnaz va ye serxwebûn**

**ji dil gur dibe**

**belê ji bo vê rojê**

**ji bo me welatek**

**bi xwîn geş dibe**

**niha careke din**

**ronahî hilat ji Rojava me**

**ligel Başûrek serfiraz û bi hêz**

**yek dibe gavê me**

**ev e heyva Eylûl**

**Payîz tê de bar kir**

**qêrîn kir buhar**

**ku nasnameya me**

**bi coşî vejîn be**

**li rûkên cîhan**

## Destana Sirûcê

**Ey dîroka xapînok**

**mayî li ser neqşa zemînê mîna mar**

**her vir û xap**

**cilkê rastiyê te lêkir**

**car bi car**

**lê bawer ke ronahî tê piştî tarî**

**wê ronîkê deşt û war**

**meyzîne şêrên Sirûcê**

**her vejandin azadiyê**

**bûne lat û ew zinar**

**wan parastin gund û şar**

**ji bo bixînin zordariyê**

**koletiyê**

**ew birînên kûr û jar**

**ew neviyên**

**,Dabanê - jîr -**

**ê şikand baskê neyar**

**dijî-(7) paşayê milan - rabû**

**û rahijte nirx û bar**

**ew paşayê cerdevan**

**her dixwest dagir bike**

**wêran bike**

**tax û bajar**

**desthilata êş û zorê**
**her bi destên van egîdan**

**hate xwar**
**her çiqas dîtin gurandin**

**wan serê xwe danexist**

**mîna - Hesê - lawê Daban**

**bû  nîşana merdiyê**

**rêza mêvanê xwe girt**

**bo wî hate qirkirin**

**du birayên wî jî ketin**

**xefka wan Tirk û Ereb**

**bûn nîşana baweriyê**

**û hevjiyana aştîxwaz**

**lê di nav komên neyar de**

**namînin sozên niyaz**

**wan bi tundî**

**li dijî Kurdan şer kirin**

**her ji bo Kurda nebin yek**

**bûne yek**

**nav dîroka bê ser û ber**

**bûne ronak**

**bûn nîşana berxewdanê**

**bûn metirsiyek giran**

**lê çi bêjim her neyar e ew felek**

**lê - Miho - her çû bilindî**

**pêş de diçû mîna sîper**

**bawer e bi nirxên gelê xwe**

**bîr dibir xewna bavê xwe**

**geş dikir hêrsa giran**

**radikir tola biran**

**dîlkirin Miho û şandin**

**cîgehek dûr û biyan**

**lê çiqas çû dem û dewran**

**şopê wî her tê xuyan**

**ew neviyên -Kero -û –Hemê- û –Hesê Daban**

**her vejandin berxwedana çerxa bîstan**

**,ketine doza (9)Şîlan û Zîlan**

**û Dicle û Bêrîtan**

**piştî wê şervanê perwer**

**ketine dîroka resen**

**mîna Haçim, Şêx Nebî**

**ew her diçandin tovê vînê**

**wan tîrêjên azadiyê**

**şîn kirin  jîna mirovan**

**hilweşandin avahiyên olperestan**

**îro roja şehnaziyê**

**her gazî kir Kobanî**

**bang dike**

**her gav dipêjê**

**nanê jiyana nûjen**

**Paşayê Millan: 1834_1908 (7)**
**Ibrahîm paşa :serokê êla millan di bakûrê kurdistanê**

**Miho: Mihoyê Elî daban,Serokê êla Kêtikan, dijî paşayê Millan  (8)**
**şoreşek rakiribû**
**piştî bavê xwe ELî daban, wekî konfedrasyonekî ji hinek êlan li deşta sirûcê**
**demezrandibû  bo hember êrîşa paşayê millan rawestê.**

**Şîlan ,Dicle , Bêrîtan , Zîlan , Haçim , Şêx Nebî, Şehêdên doza  (9)**
**azadiyê di şoreşa PKK de**

## Evîna birîndar

çîroka dojehê dinivîsim

dema welatekî

bi nezaniyê

bi dirûtiyê

bi nexweşiyê dibrêje

dema ku gelekî dixapîne

bi çepik û tilîliyan

li welatê ku gur û heftar

têde bûn xewdî rêgez û nîşan

de bistire ey birîn

welatekî azad çêke

bi xwezî û hêviyan

peyvên me bikire

dilên me nefiroşe

ji van riyên tev bi axîn

ger neyê mizgîn

nebêje wê ji hişmendiya neçaran

**raperîn biafire**

**peyvên me bê xwedî ne**

**li ser pirên dîrokê**

**pêxwas dimeşin**

**pirsa siwaran dikin**

**ên bi xwîna wan**

**dergehên gulîstanê vebûn**

**gazind di cihê xwe de dimînin**

**birçî**

**tazî**

**girêdayî**

**evîn bûye leşgerekî seqet**

**di welatê me de digere**

**dixebite**

**alîkariyê dide hev**

**li kolanê hinek kesên ne diyar**

**cil û çekên wî jê dikin**

**birîndar dihêlin**

**li ber dîwaran**

**strana şagirtên xwe dibêje**

## Gulên Berbangê

Li nav deryaya ramanan

evîna te dinivîsim

wekî sîper difiriyam jorî asîman

sirûda pistepistên te dişopînim

mîna dergûşekê di xew de

nîgaşa te dilorînim

li ber kolanê nalînê

tenê dengê te yê bi awaz

giyanê min dinirxîne

tenê porê te yê zêrîn

Buhara min dixemilîne

tenê dûrbûna te yarê

birînên min dixapîne

di nav deryaya hêviyê

çiqas digirî pênûsa min

li ser peyvên girêdayî  bi axînê

# Pêla Zanînê

**Bi baxê evînê, bi xemla hebûn**

**emê çê bikin bingha zanebûn**

**dijî tariyê, olperestên qirêj**

**bi her awayî bişkînin asêbûn**

**civaka ronavêj,  xwedî nirx û bîr**

**li ser milê we peywira dayînê**

**ji malbatê bigrin riya avahî**

**bi xwendin û ked xweş bikin vê jînê**

**çiqas barê windabûnê zehmet e**

**dema em jibîrkin rêya zagonê**

**ev e rista min rêça hestên şiyar**

**ji êşek kevin tê, ji xemgîniyê**

**ev e hêza zanyariyê ger hebe**

**wê her şîn bibin baxçeyên hayînê**

# Vejîn

Li ber dergehên sal û deman

ez hatime bînim ziman

peyvên bedew, hestên qelew

her tên di bîr, têne giyan

her gavê ez baxê te me

ey bihna nêrgiz û çeman

li nav ceng û volkan û mirin

her mayî tu vîna jiyan

hevjîna dil , şoreşa min

gola evîn, heyva şevan

demsala min, gerûdna min

bê te buhar mij û doman

xemla bedew, bejina te ye

deşt û newal , berfa çiyan

xewina welatek serfiraz

doza vejîna niştîman

## Ji mîra Peyvên min re

**Ji te her tên hemû şahî**

**dilê min  ji bo te gurgan e**

**ji nav nalîn û bîranîn**

**hemû sozên sipî man e**

**bawerke bê te ev jiyan**

**bê nirx û vac û pîvan e**

**bawerke yarê ev Adar**

**bi dûrbûna te erzan e**

**bi te ez çêdikim hêvî**

**bi te jiyan gulîstan e**

**ji ber tu mîra peyvên min**

**giyanê min dibistan e**

**ji çûk û perwîn û bilbil**

**rewanê min zivistan e**

**zivistana evîna min**

**bi reng û nav û nîşan e**

**wekî bejin û sîtava te**

**mîna te yarê gulxan e**

**tu ronahiya hestên min**

**jiyan bê te ne jiyan e**

## vedenga Komkujiyê

**Ev ola xwînmij û hov**

**xwe ji her maskî derxistî**

**lê gelên jar û bê hiş**

**hîn vî olî parastî**

**-Efrîn- tu cergê helbest**

**ew fîxana dilsotî**

**ew bahoza girs û dîn**

**hember hêzên faşistî**

**ew hêrsa dijwar û kûr**

**li ber pîlanên zordestî**

**ev derd û êş û azar**

**ket nava xwîn û hestî**

**bindestiya hişmendî**

**bû bingeha bindestî**

**komkujî li dû komkujî**

**li serdema serbestî**

**Rojava Kurdistan im**

**doza min her serkeftî**

**li ser rêça nirxên zikmak**

**li ser rêbaza Zerdeştî**

**em ax û av û agir**

**bayê pêlên zanistî**

**Kurdistan li ser her tiştî**

**jorî astê partîtî**

**4-10-2016**

## Werin

**Werin**

**em gav bi gav**

**nûçeyên hevşabûna stêrkan**

**li ber pencereyên evîndaran bişopînin**

**dengê daholên cengan paşguh bikin**

**tenê pêlavên şervanan**

**ji pêşeroja welatan re ronahî ne**

**xak tenê dibîne**

**gulên buharan**

**li ser laşê wê padîşah in**

**evîndar  li  ser gewdehê wê**

**beyreq û al in**

## Lorîn

**Evîn coş e di eywana birîna nû**

**dibe hêrsek di devê ba û bahozê**

**şeva xemsar dilorîne**

**wekî -Nîtşe – emê bêjin**

**jiyan latek ji êşan e**

**divê em bikşînin derdan**

**heta em carekê bijîn**

**bi azadî**

**bi mêranî**

**belê ey dil**

**tu bûyî çoleke winda**

**ji te dûr in hemî hêvî**

**bûn e gotin  di rûpel de**

**li ser sîngê te jîna xwe dinivîsim**

**li nav deştên kezî û mil**

**dixwînim paşeroja xwe**

**dibînim wêneyên avê**

**li ser tênûsa Payîzê**

**evîna te dilorînim**

## Qêrîn

Nizam yarê
çima hêvî dinale
li ber guhê bêzar
çima dimre ken û şahî
li nav axîn û peyvên sar
di nav pirsan de ez dijîm
dixwîn im ropelê rûbar
diweşînim xunava gul
mîna helbest, dirajim bar
nebe narvîneke rûreş
nebe xemgîn
nebe xemsar
bibe gerdûnekî serxweş
ji jîna min re ey Avdar
nizam yarê çima jiyan
dişopîne birînên jar
çima nalîn û ev kovan

**me dişkîne dike hawar**

**çima her tên birînên germ**

**dibin axîn û tev azar**

**jiyana xemgîn û xembar**

**bibe hêvî û ronahî**

**dijî ahîn**

**bibe zinar**

**were çêke ji bihna xwe**

**sirûda maç**

**di her êvar**

**du sêvên xwe bixemilîne**

**bi maçên min**

**heta kengî emê li ser pencera reşbîn**

**bikin fîxan**

**bi derbasbûna demsalan**

**ji bona te dikim gazî**

**dibînim bejina te yarê**

**mîna neqşê welatê min**

**tu bûyî lê birîndarê**

**ligel te ez dibînim roj**

**dixwînim dêmê êvarê**

**te ez xistim**

**di zîndana evîna xwe**

**sîtemkarê**

****

**lê jîna min**

**mîra hêvî**

**vîna ezman**

**finda tarî**

**tu jîna nû**

**deşt û kanî**

**stêrka Adar**

**dengê qumrî**

**roniya çavan**

**bejindarê**

**bihna beybûnê**

**nêrgiz û lala**

**çêke şahî**

**berde ahîn**

**bibe mizgîn**

**ava bike hêvî**

**bê te giyan**

**cîgeha birîn**

**rake ew bask**

**li ser sîngê berfîn**

**çendîn xweş in**

**ew maçên şîrîn**

**çendîn zor e**

**jîna bê evîn**

# Peyam

**li xaka Mîtaniyan**

**ji serdema çandiniyê**

**ji dema- Sumeriyan- ve**

**her tişt ji kevinê dîrokê diaxivin**

**her tişt dibêjin**

**li vir şaristanî vejîn bû**

**mirovê hişmend jidayik bû**

**li vir- Zerdeşt - diramiya**

**di wan deman de**

**Tirk  li çi digeriyan**

**li mêrgên xwe yên zuha de diçêriyan.**

## Barîn birîna giran

Destana me

her bi xwîna cangoriyên şêr û gernas

tê nivîsandin ji dil

destana Efrîna zêrîn

hêrsa hîm û latê şil

berxwedaniya sirûştê

tê vejandin mil bi mil

ez li vir qet naçime dûr

nobedarê Efrînê me

her wisa anîn ziman

ew keç û kal û ciwan

ew dîroka bê rêgez

jê bibe şervan bi lez

çêke ferhengek ji êgir

naveroka wê tenê

ew viyan û berxwedan

warê - Barîn - û - Avêsta

cîgeha balindeyan

dojeha dagirkeran

têkçûna wan roviyan

ey şahîda şêrejin

laşê te laşê me ye

laşê ew xaka pîroz

cîgeha cangoriyan

tu tîr î di çavê bêbextan

qêr û volakana me yî

nêrîtiya wan qirêjan

kete bin lingê te Barîn

laşê te ê pê dilîstin

gora cehş û çeteyan

laşê te digrî mirovahiya hatî qirkirin

reş dikir helwesta cîhan

serdema bêdengiyê

şermezar kir

şermîya

rûreşîyê

durûtiyê

tozê pêlava te Barîn

ji dêma wan hêjatir e

**pêlava te ji olê wan î**

**tev qirêj pîroztir e**

**pêlava te ji riwê tirk û ala wan**

**bi rûmetir e**

**ey şehîda perwer û hêja**

**tu qêrîna me yî**

**navê te wê her bimîne**

**li ser dil û hiş û ziman**

**zindî yî tu li ber deman**

**ey birîna pir giran**

# Find û Heyv

**Li welatê kavilkirî**

**hêvî di çarçoveyê wê de**

**pêxwas li gorên xwe digere**

**geh bi stranan**

**û geh bi xweziyan**

**cil û bergên serkeftinan didrûn**

**helbestvanên wê peyvan dicûn**

**bêyî ku dev biweste**

**an bipirse**

**çima em di dema neçarî û bêomîdiyê de**

**li pey hevokan dibezin**

**ma peyv çi ne ?**

**beramberî çewtiyên kiryarên seqet**

**wisa jî em wek xewndarên belengaz**

**xwe li ber agirê helbest û stranan**

**germ dikin**

**heta em binêrin wê felek çi bêje**

**li welatê me sînor dinalin**

**mayîn di bin baran û lehiyê de digrîn**

**evîndar jî tî dibin**

**ji rondikan**

**baranan diafriînin**

## Navê min

**Navê min li ser lêvê te**

**rêyeke zirav û dûr e**

**têde azadî siwarên xwe bi rê ve dibe**

**navê min li ser dilê te**

**hespekî bi bask e**

**mizgîniya serfiraziyê**

**ji axên binpêkirî re dişîne**

**navê min di hembêza navê te de**

**xwe bi ava wateyan dixemilîne**

**di hinava bê de porê te**

**dibe stêrkeke sibehî**

**li ser çiyayê sîngê te dibe sîper**

**dibe padîşah û serwer**

**di hizra te de**

**li ser lêvên te dibe nasnameya min –Rêber-**

**û Payîz dibe mîna buhareke bextewar**

**bi hestên xwe ve û bi pelên zer**

**dibe mij cîgeha ronahî**

**dibe beybûn yara wî**

**dibe zivistaneke rêwî**

**cîhaneke sipî**

**ji kenê zarokên birçî**

**ji hêviyên tazî û tî**

**navê min mîna çirûskeke şîn û bi girî**

**xwe tevlî kenê te dike**

**ku nemîne bê xwedî**

**navê min dîlber**

**aştiyeke hember şer**

**xewineke aram e**

**di cîhaneke bê ser û ber**

## Şagirta min

Tu viyana hêviyên min

tu giyana xewina min

tu lehiya hestê peyvan

şoreşa jiyanê min

tu ronahiya şevan î

ey zemîna peyvê min

her ez û tu ne bi hev re

ta dawiya hêsirê min

her em ê jîna xwe bijîn

da ku avabe evîn

ku bibe taca giyanên dilbixwîn

û bê Buhar

ey Ferata nazik

û gewre û şîrîn deng bike

peyv û awaz her melûl in

çok û bilbil

dûr diçin

giyanê dilzar û axdar

**her dinale  ber Payîz**

**ew viyana dilniyaz**

**ew birînên nerm û zîz**

**derdixe êşên sedîsalên bihurtî**

**yara min**
**ava - Dicle - hundirê min**

**- Zap- û –Xabûr - têne min**

**bê te ev dil tim dinale**

**bê te şahî nayê min**

**tu dibistana evînê**

**ey jiyan û xewina min**

**baran î tu**

**germa havîn**

**hest û bîranînê min**

**hevjîna giyanê min**

**tu tenê şagirta min**

**ku newê xemgînî dîsa**

**ku nebe mîvanê min**

**ez te têxim nav kenê xwe**

**ji bo mirin binax bibe**

**ez te têxim nav dilê xwe**

**ji bo axîn bimre di min**

**her tu yî helbest û awaz**

**Kobanî û kaniya wê**

**kolan û tax û zozan**

**û ew gir û Newroza wê**

**eywan û taca Mîdî**

**desthilat û burca min**

# Hêsirên te

**Hêsirên te ew dengê dil**

**li ber salên derbasbûyî**
**ew tîpên dilmest û gêj**

**li nav peyvên helbestên dîn**
**her berde ew hêsirên dîl**
**derxe ji hest û çavên şil**
**birjîne ew ava ku**

**ji her êş û azar çêbû**
**bigrîne tembûra tî**
**ew pênûs û pelgên min**
**azadî tu ji her tiştî**
**ji her bask û bendên birçî**
**li ber baranê dimeşim**
**hêsirên te di nav çavên min**
**hêdî hêdî dimeşin**
**xemgîn e ew dar û war**
**li ber hestê min ew baran**
**ji êgir pêk tê**
**ji ew doman**
**ew hêsira ji çavên ezman**
**dertê ji ku**
**ji ber çi ew**

**ez kirime nav**

**cengê hiş hember giyan**

## Dil her tî ye

bê te sibeh hîn tariye
bê te kenê min ji bo çi ye?

gerdûna helbest û huner

dîdara te ew şahî ye

sînga te ew ewra sipî

ew hişbir e geh rastî ye

li ber memikê te

raman dibim

geh mest dibim

dil her tî ye

ferhenga jiyana bi çêj

ew gewdeha dildarî ye

zindî dibe xewina bedew

ji bo min vîn û azadî ye
her ku diçin sal û deman
li ber min dêmê te ronî ye
ez bê te qey helbet nînim
bê te evîn tev şênî ye

## Vîyana dê dawî

**Evîndarî**

**li warê Zîn û Şîrînê**

**çiqas zor e**
**dilê peyvan dirêxînim**

**li ser pêlên demên bê hiş**
**li ser bayê henasên tî**

**dixwînim te**

**sirûdên xav**

**li ber leylan û nîgaşan**

**dilorîn im**

**dimînim carekê bê deng**
**di sîngê te**

**xemên yekbar**

**disojînim**
**heta berbang bike fîxan**
**nexweş im**

**mîna gerdûna dîn û serxweş**
**dinalim mîna bilûrlan**

**di nav cengan**
**were ji dûr ve**

**ji nêzîk ve**
**heta tiştek**

**ji hestên xwe bijîm carek**
**temen kurt e**

**jiyan xewin e**

**birîn germ e**
**ligel hev azadiya xwe**

**bikin zengil li vî warî**
**bibin rojbûneke rastî**

**ji dildarî**
**bibin ew xewin û ew rastî**
**bijîn carek bi dilşadî**
**welatî tu ji hêviyê**
**bilûrî tu**

**di nav giyan û hêsirê min**
**bi xemgîniya xwe dijîm**

**li ser pir**

**li ser çemê bêbext**

**sîtava te dişopînim**
**bi min tê xemgînî ji bo te**
**ji ber dûrbûna te zor e**
**tenê viyana bê dawî**
**ligel hêvî û dilsozî**
**dikare şahiyê çêke**

**di jiyanê bibe ji bo me**
**evîn  û hêz û ronahî**
**dibînim xwe li sîngê te**
**diforim mîna agirpêj**
**mîna nêrgiz û beybûnê**
**xemên bêbext disotînim**
**ligel te çêdikim şahî**
**ku barke ceng ji gerdûnê**

## Ramîn

**Serdema kurdî vejîn bû**

**di giyana Ramînê xurt**

**bû rûmeta Rojhilat**

**gazî kir hestê pepûk**

**ew sêdar û daliqandin**

**naşkîne viyana gel**

**qet nikarin qir bikin mafê rojê**

**ku li welatê agirî nûşîn bibe**

**dengê te Ramînê mêrxas**

**hêrs û volkana me ye**

**wê nemînê laşê te**

**li nav kolanên gêj û mest**

**dijî zordarî, bi hev re**

**bûn metirsî bûne gef**

**tevgera zanist û bîrnas**

**pênûs û çek rakirin**

**em çira ne**

**ronahî ne**

**li ser rêbaza azadiyê**

**zindî ye komara me**

**dest bi dest îro bi hev re**

**têkbibin zordariyê**

**- Xaminî- ew**

**Ezdehakê çerxa nûjen wê here**

**wê bi sêdara şoreşê li dar bibe**

**kanî Kawayê Hesinkar**

**kanî ew roja bedew**

**ta hemû ruknê neyaran hilweşin**

**li ber hêrsa gel**

**serdema mîdî ne dûr e**

**wê bi cih be di Rojhilat de**

**-Qurşê - bêbext wê nemîne**

**li warê şêrên Mîtanî**

**binkeve navenda zorê**

**doza te wê bi serkeve**

**dilrehet be – Ramînê - gengaz û dilsoz**

**berz e şopên te heval**

**nêzik e şoreşa mezin**

**banga wê tê ji dengê te**

**namirî tu, zengilî**

**di hizr û dil de vejînî**

**gur dibî**

**bi zendên ciwanên**

**qehreman û hesinî .**

## Agirê birçî

Agirê bêbext û bê bend
kîna xwe difroşe dil
berhemên kovana gelên
bê çira tev de diçin
aliyên bayê Zivistanê
dişînin zehmetî
xemgînî sihwana xwe danî
li warê ronedî
agirê zordar difûre
şewqa xwe dispêre kul
laş û hestî têr dihêre
birçîbûna xwe giran e û bê sînor e
çav û por û dest û mil
kete nav hestî û cil
deng dide li Amûdê her sal
di gewriyê bilûr û tembûr

**agirê birçî û kevinar**

**tê vejandin**

**nû dibe**

**agir e dagirkere**

**şer dike bi êzingê hestan**

**bang dide di qurzîka xwînê**

**geh dibe hêrsek giran**

**xêz dike leylana bê hiş**

**ew lehiya miçiqî**

**qet nizanî di wê sirê de**

**dojeha sor têkbibe**

**agirê kurdî bi derbasbûna çerxan**

**laşê gengaz tim dixwe**

**lê çima agir diweste**

**li ber deriyên dijminên me**

**ew li her çar aliyan**

**şûr û rim û agir in**

**û em belav in**

**mîna laşên tev biraştî**

**li sînema çerxên nûjen**

**rûpelên êşên beloq**

**geş kirin xemgîniyê**

**ew şeweta dilrevîn**

**ava kir dilzariyê**

**agirê birçî û tî**

**bû sêdara şahiyê**

**ax çi kûr e ew şewat**

**xwînmija zaroktiyê**

**Sînema Amûdê bû**

**cîgeha rûreşiyê**

**qir kirin zarok û zêç**

**nobedarên tariyê**

**lê nikarin finda hêvî vemrînin**

**qet nikarin bimrînin ronahiyê**

## (Helebçe)

**Li ser Helebçe hest dinale**

**hiş jî dimre li ber nivîsê**
**roja çûyî mîna îro**

**qir kirin newroza me**

**jiyana bindestiyê**

**bû durişma jîna me**

**parçebûn.**

**dagîrkerî.**

**parê gelê ronedî**
**li ber sînoran**

**rengê jîna bendewar**
**bandike qêrîn dike**
**li ber sêdaran**

**jiyana xwe**

**distirînin**
**Çêdikin hêvî bi hêsiran**
**Şahiyê binax dikin**
**kew ligel hev**

**dema tengasî dibînin**

**pevdiçin**

**mîna kurdan hev dixwin**

**meyzîne şoreş û tevger**

**çawa têkçûn**

**wek dibêjin:**

**kurmê darê**

**bingeha xwe ji darê ye**
**narvîna kurdî çîrokek**
**Pê felek tim mest dibe.**
**Bilûrê xemgîn**

**bi destê bê lebat de sincirî**
**dengê xwe dispêre çiyan**
**dighîne laş û hinavan**
**bihna sêva xapînok**
**li ber deriyan**
**deşt û zozan û çiyan e**
**li ber dîwarên zîndanê bîr**

**va Helebça careke din**

**mîna êşek sermedî**

**berze di dil de**
**va ye hêsirên pir dirêj**
**dimeşin li ser riwê virmor**
**narvîna kurdî**

di neqşê rojhilat de
komkûjiyek sar û gêj e
zindî ye di cîhana me
kî wê rojek
tola adarê hilîne
kî wê hêvî ji girtîgehê

derxîne
Yekbûna hizr û giyan

wê bi zendên keç û xurtan

her bimîne
ew tenê findên şevan in

ronahî ne
yekbûna kurdî tenê

wê azadiyê bistîne

## Ahengek mestbûn

**ez e hestê kor û biyan**

**derxînim**

**li ser ava şewqa te**

**demsoza min**

**nîgaşa belengaz**

**dinale ji dil**

**dirêxîne Ezman**

**li warê gulan**

**di memikên te de**

**raperînek dijî**

**di nav de jiyan**

**kaniyek hingiv e**

**di nav de**

**evîn û birîn serwer e**

**were bê te cîhan**

**doman û şer e**

**dûrî ceng û zordarî û zehmetî**

**dûrî êş û bîranînên ronedî**

**li ser te belav im**

**mîna pelê daran**

**ji ber gewdehê te**

**welatek din e**

**di çarçovê wê de**

**çivîk rêber in**

**ziman û tilî**

**ramûsan daner in**

**Sirûd û huner**

**li ber derî westiyan**

**evîn jî li warê rojê**

**bê per e**

**giyan bê ser e**

**ligel te jîna min**

**bi çêj e û xweş e**

**li ser memikên te**

**lêvên min serxweş in**

**bi xalên li ser sîngê te dilgeş in**

## Argûna min

Têm ji bo lêvên te ên sar
bi volkana dilê xwe
germ bikim
û cêwiyên kevokên te yên dilmest
bi maçekê razînim
û bi mêtinekê ji nû ve şiyar bikim
sînga te aştiya windayî ye
ji bedewbûnê re deverekî aram e
zimanê te bi zimanê min re

dîlana agirpêjiyê digerîne
ramûsanên kevirî nahebîne
ji derveyî dan û standinê maçan
destanên lehengan

efsan in
laşê te peykera xwedayekî zindî ye
berî ku memikên te  çêj bikim
min digot qey xweda mirî ye
Ez têm ji wan rêyên tev berf û seqem û zihêr
ku li ser destê te
tîpên germbûnê fêr bibim
argûna min

## Bajarên tozê

dirêj li te dinêrim

ey ewra min e koçkirî

êdî ez ji sibehê ditirsim

ji êvarê diwestim

bûm e kaniya avê

nepeniyên wê zuha bûn

zelalbûna wê miçiqî

ewra min

ey şoreşa min

têkeve hundirê min

ji bo jiyana xwe bidestxînim

li ser têla peyvan

bi awazê

ketina te a dilpijok saz bikim

dînîtiya xwe xelatî min bike

şerpîna xwe bide min

daku şiyar bim

**ez vebûna xunava buharê me**

**herikandina xwînê**

**di damarê de me**

**şoxa min vegerîne**

**daku mîna helbestê biweşim**

**li ser bihoka giyanê**

**ji bo ji tarîbûna odeya xwe**

**findan pêxînim**

**têkevim asîmana axaftinê**

**li warê valahiyeke girs de**

**fîxan bidim**

**ji şeydabûnê bêhiş dibim**

**paş qurzîkên fereh de**

**xwe vedişêrim**

**ji bo te li ser daketina xwarê**

**bihêvojim**

**ey ewra min**

**ji te hez dikim**

**çi berg be**

**an cakêt**

**an pantorekî**

**li xwe bike**

**an min li xwe bike**

**çavên min balekona te ye**

**û destê min jî derpoşa te ye**

**de bi min re asta herî bilind ji dînîtiyê pêk bîne**

**dibe bibim keskesorek**

**an kevanek**

**dibe ku ez bibim dem û cih**

**bibim burcekî dagirtî ye bi mezinahî û dînbûnê**

**bi dirêjdem bikevim**

**û berken bibim**

**berî erd hest bibe**

**bi sîmfoniya ketina min**

**ev cîhana dewlemend**

**mîna şokolata koçbûnê**

**tarî ye mîna çavên te**

**ey ewra min a koçkirî**

**êdî vegere**

**ji ber ku berêvar vegeriya**

**xweziyên Rezberê**

**ji hêsiran re naura nîgaşê vedike**

**mîna meyê  di peyalê de**

**di rakêşana memikê te de**

**hestekî bi hişê stêrka rijî dileyze**

**tirsa memikê dirajim**

**gilêza derzên rewek**

**palgehên striha genî**

**ji bo pê mezinahiya lêv**

**qirecirên avrêjê**

**birîna şewatan**

**şiyar bikim**

**qêrîna temaya xwe vedimrînim**

**bi dilroşbûna xwe ya giran**

**daku roniya sermedî biçespînim**

**ji binefşa dilşikestî re vedigerim**

**ku min bi nazikbûna xwe wêran bike**

narvîna kavilê

xwe bi siha agirê min vedide

ta bigihêje kûrahiya deryayê

bi hêrsrbûna qûmê

min pirên tengavê

ji binê talanbûnê

derbas dikirin

li jêrî dojeha min de

binefş li ser xewinên dilpijok

radiwestin

windabûna riwê sor

cihê mixabiniya min e

ew qerenfîla ku bi dildarî

hatiye şewandin .

dojeha min barê dojeha te dikşîne

ji bilî zengê xwe ve

ti xelatî ji xirêna te re ranakim

birçîbûna xwe bide min

dibe ku tariyê bidest xwe xînim

**min êşê xwarin bide**

**ta bibim mêr**

**ziquma te buhişta dînîtiya min e**

**jibîr neke ahîna min e nixumî**

**pepûkiya xwe ya hilandî**

**diyarî wê dikim**

**seqema awirên xwe**

**xelatî min bike**

**di talîzokê girtîgeha xwînbûyî de**

**ezê hêsira xwe mîna qurşînê**

**li ser deverên bêdengiya te berdim**

**dengê te bipêçim**

**vedengê henaseyên te bimijim**

**sertbûna şêlobêliya min a gunehbar**

**li ser rêyên reş de**

**bi sermayê disojim**

**paş gemiyên min ve**

**kêlek payizekî girtî**

**û zivistanekî şêlîbûyî**

**hebûna xwe bidest dixim**

**ezê devê hêsiran**

**ji bo pariyên vegerê vekim**

**nîvê hinek ji min**

**nîvê tevahiya min**

**sê ribê şeyna min**

**tonek ji kovanên min**

**lîtrek ji nalîna min**

**xeyda jinên rojhilatî digire**

**domahiya min beredayî ye**

**domahiya te yara min beredayî ye**

**em herdû mîna du kîvroşkên tirsok in**

**bi evînê dihelin**

**bi veyrûsa tunebûnê ketine**

**ti asîman nîne me bihewîne**

**ey keça min**

**em li ser sînor in**

**bi hev re sekinî ne**

**mîna du sikeyan**

**ji derveyî erdnigariya nalînê**

**li ser hevdû hildibin**

**parçeyên hevdû parve dikin**

**guh nadin fûtiya bê**

**pêxwas di nav berfê de digerin**

**birûsk firtikên xwe me xwarin nade**

**xwe radestî latên şermbûnê nakin**

**tawûsên mezinahiya xwe digurînin**

**rikbera min**

**derbasgeh ji sedema tîrbûna xwîna me**

**girtî ne**

**alî ji sedema xemgîniyê ketine celbê**

**de bilez vegere**

**emê li pêlavên xwe siwar bin**

**û bifirin**

**ji derveyê bajarên tozê**

## Bi vegera te re

**Nivîs xwe qurbanê hatina te dike**

**piştî dûrbûnekê**
**û ez bi deng û tîpên te**

**mîna erdhejekê**

**dihejim.**
**Min perdeya guhê bîrêkirinê**

**her şev bi navê te**

**qul kiribû**
**ne hêsan e mirov**

**li bendemaniyê de bijî**
**bi dûrbûna te**

**endamên min xwezî kirin**

**ku çavê wan hebana**

**ta bigryana.**
**Bi te re evîn weke mirovan**

**dimeşe**
**lê bê te seqet li ser kursiyan**

**dimîne .**
**Cihê xwe**

**di kurahiya çavê te de digre**

**li ser heyv û rojê**
**erd û ezmên**

**xwe dibîne**
**evîn di te de**

**naşibihe xwe**
**ne xweda ye û ne jîndar e**
**ne mirov e û ne cin e**
**bê reng e û çêj e û hilm e**
**lê ne av e**
**ew jiyan e**
**jiyaneke**

**ji derveyî sîstema vê jiyanê ye**
**evîna min bi te re**
**nakeve di çi pergal û  û pîvan û bendan**
**ne bilbil e ku di qefesan  de**

**kedî bibe**
**ne normal tişt e ku were nasîn**
**bi çend nav**

**hevok û gotin**
**evîna me volkan e**

**di nav me de difûre**
**qêrînên me dikelîne**
**were zendên xwe**

**ji paşî re**

**li dûr ser û stuyê min ve bigerîne**
**were xwe bi min bifirîne**
**hesretên azadiyê bi min derxîne**
**were sêwir û siha xwe**

**li ser min de deyne.**
**Min di nav baskên xwe de veşêre**
**xweziyan li ser lêvê min**

**bi maçên xwe razîne**
**ey keça evînê**
**Serdema nû**

**ji evîna Mîdî destpê bû**
**were li ser min**

**di van şevên buharî de**

**stêrkan birjîne**
**rehjenên min bi hatina te derketin qadan**
**were bi dengê xwe**

**kovanên min bimrîne**
**bi hatina te - whatsapp - ji şahiyê rengê xwe yê kesk diteqîne**

**Û - Fecebook - bi vegera te re**

**bi rengê xwe yê şîn ve**

**ezmanan dibarîne**

## Lutkeya xewinê

helbesta min li ezmên
mîna firindeyekê difire
li ser zemîna sêwirê
mîna kaniyê
di gewdeya te de diçe
mîna xwîna kelî dimeşe
evîna min pepûkiya hişê te diguhêre
dema xwe ji windabûnê
bêhişbûn û dînîtiyê re ditewîne
evîna te azadiya min e
di xwîna min de agir e
evîn mîna awazekî aram
li ser memikên te dibriqe
giyanê min ji nêzik û dûr ve
xwe tevlî te dike
xwe ji lawazbûnê re netewîne
bibe perestgehek
ta ku evîndar serdana wê bikin
ku bi hêsiran dilsoziya xwe
têde binivîsin
çavên te evîna qerenfîlê ye

ji çîvîkan re
du ewr û roka zêrîn in

**de germbûnê bide demsala zivistanê**
**seqemê ji ser rake**
**bila têr germbûn bibe**
**xemgîniya wî binivîse**
**Avdara wî pêxîne**
**Nîsana wî dilşad bike**
**çendîn gazina xemên xwe**

**ji min re dikir**
**dînîtiyê bide havînê**
**çendîn bêdengiya xwe dikir sirûd**
**çendîn nalîna xwe ji bê re ragihand**
**li ser bilindiyekê**

**wê xewinên me bibişkivin**
**dilsariya te di cîhana xwe de dikşînim**
**ez balekona xemê me**
**birîna vedengê me**
**şînbûna asoyê me**
**germbûna dûmahiyê me**
**di baxê gulxaneyên dûr de**
**leylaneke dilpijûk im**
**di dilê min de asîmana bedew**
**xwe bi cih dike**
**berbang bi berêvarê re zewicî**
**tiliyên sibê bi porê gulan ve dileyizin**
**pezên hêviyê diçêrînin**
**mezinahî**

**xwe ji bend û baskên rûmetê**

**rizgar dike**
**aştî jî di ferhengên cengê de windayî ye**
**pirtûk**

**ji ber peykerên serokan dimirin**
**xemên kedî har dibin**
**birînên bêbav hov dibin**
**tilîliyên dayîkan serkeftinan daner dikin**
**keriyên gêj li dû xwe ve**

**hezarên keriyan bilmez dihêlin**
**da ku tenê li ber daholan bang bidin**
**nifşên nû ji welêt baz didin**
**û nifşên ku bên**

**di malzarokên narvînê de**

**xwe sêdar dikin**
**li ber bê dergehên sêwelek**

**bê nan û av**
**rojên xwe diqedînin**
**bi werîsên çol û çiyan**

**xwe girêdidin**
**ji nifşê ku werê re dibêjim:**
**we pîroz dikim**
**maç dikim**
**ey nifşê me yê bedew û li ser rê**

**ji tenaziya we hez dikim**
**ji me re ye redkirina we**
**sed şerm û heyf**
**feleka binkeftinê**
**hêsir, qêrîn û vedengên me**
**ji min re ye mirin û xwedawîkirin**
**ku sibe nifşekî bibînim**
**şahî û serkeftinan çêdike**
**ey nifşê mizgîniyê**
**serkeftinan**
**nifşê kar û xebatê**
**ez dengê nerazîbûna we me**
**çirûska we me**
**bêdengiya we me**
**takesa we me**
**hinekî ji we me**
**ez hûn im**
**dilê min awaza kevnariyê ye**
**haya we ji helbestê hebe**
**ta hûn hebin.**

## Bixûrbûn

**Raman agirbest nakin**

**lê hilm berdidin**

**mîna gulberga hindî**

**xwe bi derbekê  bi aliyê poz ve berdidin**

**dikevin xûşavê demê  mîna danikên xoxê**

**raman bi tenê ne**

**di girtîgeha çavnêriyê de ne**

**metirsî jî beranberî wan jî dûr in**

**ew dû parsû ne**

**yekser beranberî hev in**

**merhemetî hilnagrin**

**naghêjin hev**

**raman metirsiyan nêçîr dikin**

**segvanên xwe li ser baniyên bîr de belav dikin**

**û metirsî jî mîna nîgaşên pispor**

**bi zanista virnasiyê**

**orispîtiyê bikartînin**

**xurtir in ji koleyên romayê ên zoranbazîkar**

**mezintir in ji serxweşên meyxaneyan**

**lê raman takes û bitenê belav dibin**

**ramenek dû ramanekî**

**bi rêveberiya metirsiyê**

**ta dibin hilm**

**piştre berz dibin**

# Çavên te

**Di çavên te de**

**ez buhara welatê xwe yê bindest**

**ava dikim**
**azadiyê dikim dew û şîr**
**evîna te baran e**
**bin de pêxwas**

**li kolanan digerim**
**yarê tu pîrozî**
**yarê tu newrozî**
**dema tu helbesta min**

**sererast dikî**
**dema ku tu dilê min**

**wek stonê ronahiya sibê**

**di xwe de binyad dikî**
**dema tu bi rengê dêmê xwe**

**xemla sirûştê**

**li ser darên rût de**

**weşan dikî**
**û li min dinêrî**
**dihêlî ku ken**

**siha demên min be**
**wisa xemgînî**

**matmayî û didulî dibe**
**û neyartî ji dilsozî**

**şerm dike**
**û heyv bi stêrkan re**

**şer dike**
**û ronahî xwe ji tariyê**

**rût dike**

**dilê min bixwe**
**bike hevîr**

**di legena giyanê xwe de**
**di paşîvê de bisoje**
**ji rengê wî yê melûl û virmor**

**derxîne**
**wî ji qefesa sîngê min**

**rizgar bike**

**agirê wî vemrîne**
**bila bi laşên min re**

**neyê pişaftin**
**bila bibe pariyeke nan**
**di ezmên de bibe stêrkek**

**tenê min bisojîne**
**agirê evîna te**

**ji bo min sermeye**
**ji min re dar û gul û gîhaye**
**berdevka hebûna minî**
**diruşma hêviyê yî**

**li warên rûnedî de**
**min bike kêr**

**di sîngê mirinê de**
**min bike li warê sîng û berê xwe de**
**germahiyeke sermedî**
**her dil ji ber te**

**dibêje helbest**
**ta bijî serbest**

## Çêja jiyanê

li ser maseya jiyanê

danek nalîn e

û kêrek êş e

li bendê çi me bi nerîna te?

li benda hatina te me

ey kêmê di evîna min de

ji destpêkê de paşgukirî yî
ji demeke vala de zayî
û ez jî ji qurbaniyên valabûnê me
mîna gêjan

beranberî aramiya kal de

sekinî me
xemê min di daqurtîne û nikare
aramî cerg nake li ser vê

mikur bibe
ew newêrektir e ku vê yekê bike

maseya min e virmor

mîna min û tiştên min
li ser piştê ramana min

**siwar dibe**
**ax ji qurzîkên rehjenên min**
**û ji henaseberdanê min**
**te pêş bahilkêşana evînê**

**keser berda**
**ta ku pistepistên wê bibirî**
**ez e ji birçîbûna dilê xwe re**

**bibêjim**
**narvîn te têr neke**
**ez e kesera xwe demkî**

**di zîndanê kim**
**baran min tevlîhev dike**
**tiştên niyaz**

**pirsên beredayî**
**ronavêjên şilbûyî**
**paqij in qêrînên me**
**zelal in ahînên me**
**fistanên domahîkê**
**û cilên asîmanê li xwe dikin**

# Cejina maçan

di hizrê min de

ku ez ropelên pelgê biçirînim

û biqêrim

xwe tazî bikim

jihalçûn bibim

ev cejina maçan e

û yara min devê wê ji mermerê ye

bîst hezar car min kerîniya wê şermezar kir

min di riwê eynikên zerhimî de

di ezmanê teysînkirî de rûtirşî kir

hevrikiya min bê sûd bû

û xwdan dêma birsiqî

gelek westiyayî ye

dûrbûyî ye

mîna neqşeyekê hatiye hîrkirin

tê serê min

**ku ez  veşartî bigrîm**

**nepenî paş sihên dirêj de bimeşim**

**nîva rojê geliyan vexum**

**li ser pêlên keştiyan**

**domanên balafiran**

**siwar bibim**

**xwe li ser avahiyên vala hildim**

**bê sûd**

**dikeve hizrê min de**

**camên pencereyan bişkînim**

**an xwe ji balekunê bavêjim**

**ev cejina maçan e**

**û yara min devê wê ji mermerê ye**

## Cîgeh

di pêlên te de

çirûska talîzokan in

di gavê aramiyê de

beranberî vê xezalê raweste

ta bi zîrekî li te binêrim

ey biyanê mîna kolanan

axdariyên min bi tenê bi talanbûnê diramin

mîna beqeyan wîrûran dikin

de bi dilçûyin

bi evîna min mest bibe

sibe ez e mîna peyker

binê kavilan de winda bibim

wê dizên mûzexan û şûnwaran

min talan bikin

ez te hembêz nakim

an hêrsa te wernagirim

ezê bibezim pey rojavayê

**êdî şahî min ranake**

**êdî xema min ne dilovan e**

**ey merdê mîna xunavê**

**di devê gulşîlanê de**

**nêzik bibe**

**tariya min vekêşîne**

**ta jiyan bimre**

**û ji nûve ji malzarokê te ve vejîn bibe**

**şewqa ezmên  ji zelalbûna te ye**

**asîman xwe ji te re xemiland**

**xwest mîna te xemilî be**

**ji dema  ji erdê re bû ban**

## Cîgeha nakokiyan

**Bi gewdeheke ciwan û lihevhatî**

**û bi dilekî girs û jêhatî**

**evîn weke mizgîniyekê ji min re şand**

**ronahî bi xwe re bir û gerand**

**dikir ahîn**

**bi maçên germ lehî barand**

**Şûnwar e**

**Buxçe ye**

**awirên wê stonên tîrêjê ne**

**viyana Nêrgiz û soninan e**

**keziyên wê yên zer tavika deryayê ye**

**ji bo min welat e**

**sirûda avê ye**

**hebên çivîkan e**

**kuxika heyvê ye**

**pêlên arandinê ye**

**zimînên sirûdan e**

**hemî gul jê destpê bûn**

**beybûna agirî**

**nesrîna çiyayî**

**ji şahiyê û xemgîniyê re xelek e**

**li ser zemîna laşê wê ve**

**nakokiyên rengan bi yekbûn**

**reş bi sipîbûnê re zewicî**

**ronahî xwe bi tariyê ve teqand**

**hebûn bi nebûnê re bi yek werîsî xwe gerand**

**reşbînî bi geşbîniyê re xwe afirand**

# Çîroka welatekî

**Ger ew serok koça xwe kir**

**gel wê bîne hezar serok**

**em ew gelê Kurdê resen**

**xwîna me afirand dîrok**

**ger em nebin dewlet û hêz**

**ger hilnedin ala bi rok**

**jîna me wê bê wate be**

**azadî wê bibe çîrok**

**warê bedew jîna me ye**

**paytexta qumrî û kevok**

**dapîr û bapîr û bav**

**ezber kirin ew mak û kok**

# Di avdarekê de

zaroka min
lê bîrêkirina beybûnê
dema xwe tevlî zeyzefûnê dike
berve rêyan ve
di kêlika berêvarê
ma ev gava me ya detpêkê ye
dema em berve baranekî
riwê nîsanê şil kiribû
hevdîtinê dixwînin .
An ev dema me ya dawî ye
ku em ji nişkê ve
hevdû maç dikin
berî ku seriyên gîhayê me bibînin
ey xunavkirî yê mîna sorgulê
di çaxê sibehê
çendîn bi dîdara te
min li ser lêvê te de

**maçê bê vêxist**

**Çendîn min bi ramanê xwe**

**bendemanê şêwe kir**

**min ji rojê re**

**ji gîtar û kenarê re**

**bilêtên viyanê vegerand.**

**ta min bilêta xwe**

**li ser rêya te de**

**jibîr kir**

**di min de yara min**

**êşa moriya sor e**

**dema li ser quma germ**

**hildikşe**

**di min de**

**ey razayî yê mîna gemiyê**

**li ber bahozê**

**dêmek ji ezmên re**

**dema tênosên êşê**

**û baranê diwerîne**

**bi bîrêkirina beybûna**

**a xwe tevlî zeyzefûnê kirî ye**

**di çaxê berêvarê de**

**li ber te ve têm**

**min yekbûyî**

**binyadkirî bi te**

**bipejirîne**

**Ey çiyayî ya pêveçûn û şewatan**

**ezê li ber te**

**di avdarekê de**

**gulgulî bibim**

**êdî turikên wexerkirinê**

**min nexapînin**

**wê bavlîsokên tozê jî**

**min nesekinînin**

# Di Şeva Xedrê de

**Birîndar in**

**mîna axdariyên xwe**
**mîna qîrewîrên zarokên xwe**
**girî lal dibe**
**laşên birîndar bi derbekê de**

**sar dibin**
**xwîn diaxivin**
**gazindên - Dêrsimê-**
**li ber guhê -Miştenûrê - dibêjin**
**pirsa kuştiyên bê guneh ji felekê dikin**
**aştî li xwe digere**
**azadî serjêkirî li kolanan**

**avêtî dimîne**
**fîxan konên xwe**

**li ezmên vegirtin**
**li ser welatekî**

**bi xemên tolhildanê fetisî ye**
**bi hêrsên Egît û Mezlûman tije bûye**
**laş li ser laş diqêre**
**şûrê islamê li ser stuyan ve tê kişandin**

**çîroka welatekî sêdarkirî**
**bi çend kêlîkan ve**

**vedigerîne**
**pêxemberan di wê rojê de**
**mîna parsekciyan**

**li kolanan diçêryan**
**li xwedê digeriyan**
**mirin ji me baca hebûnê dixwaze**
**di hundirê me de şiyar dibe**
**bi me re diraze**
**sêdar jî mîna katê dîwêr paldayî ye**
**keser ji bejinê me dirêjtir bûye**
**taxên Kobanî lal in**
**birîndar in**
**navên me**
**nasnameya me**
**li dadgehên dîrokê de tewanbar in**
**xelkên li erdê û ziqaqan bê liv man e**
**rewanên wan şiyar man e**
**Li ber rojê disincirîn**
**ji paş mirinê ve li me dinêrîn**

## -Dîlbera gir-

**Cana dil şîrîn û rind e**
**Hişê min bir ,bîr jî bir**

**sînga wê paytexta perwîn**

**lêvê wê warê şekir**

**awirên wê agirî ne**

**zindî ye her gav li vir**

**çendî Dînbûn har û mest e**

**xapînok e qirecir**

**gote min hêdîke cano**

**li ser girên min çêke pir**
**Efrîniya xemgîniyan**
**zeytûn ji dil gazî kir**
**bê wê hir tişt tar û mar e**
**bê kenê wê vîn di mir**
**min bi wê re şahiyê dît**
**hez dikim wê pir û pir**
**ew çem û zozan û dar e**
**roj û heyv û bayê sir**
**deşt û kendal û newal e**
**dîlbera çiyan û gir**

# Baran û xerîbiyê

**Baran min şil dike**

**min di çavên xwe yê fereh de**

**vedişêre**

**ji min re nûçeyên seyrana koçberên**

**ên bi lingan meşîn**

**dibêje**

**min bi nermbûnekî xapînok**

**li ber xwe dide**

**awiran li min vedide**

**behsa min**

**ji min re dike**

**bersiva pirsên min ên**

**mîna tayê dide**

**ez kîme**

**siha dawiyê me**

**an nexweşiya destpêkê me**

**û herdû mirinekin**

**li ser şopa mirinekî mirî**

**diaxivin**

**ez xewina kesk a şewitî me**

**çemê bûye lehî**

**ji çavê zarokekî sêwî**

**derdikeve**

**birayê xwişkeke**

**jiyana xwe bidawî kir**

**birayê xurtekî**

**dihû hat e gurandin**

**ez ew çemê jehrkirî**

**ji devê zarokekî derdikevim**

**li Helebçeyê an li serê kaniyê**

**belavkerê çîroka – Elifik –ê me**

**bergîla a di rojekê**

**bi pêxember ve**

**rabû ezmên**

**şopên – Xandî – me**

**a ku ji mirina xwe vegeriya**

**berve nimêjekî**

**bi mirovan yeqîn e**

**xwe ji jiyanê re ditewîne**

**ez ew rîbana sor im**

**li dûr noqa keçekê**

**hember zordariya sitemkarên**

**ên ji dojeha sermedî**

**vegeriyan**

**serî hildide**

**min çekê xwe hilgirt**

**ji bo ez li pozê feleka hêrsdar dim**

**û eywanê wê ya di hişên mîkrobkirî de**

**bicih bûye**

**wêran bikim**

**baran paseportekî**

**xelatî min dike**

**li riwê wî de çedikim**

**û li nav celb û cenaqê de dimeşim**

**ta ku ez ew ronavêja barkirî**

**bidestê xwe xînim**

**penaberiya min**

**bi otumbêlên mirinê**

**ewtewtên kuçkan**

**orispîtiya siyasetvanan**

**nalînên dayikan**

**tirûmbêlên pilêtkirî**

**û xwînên ên kolanan sor kirin e**

**dagirtî ye**

**penaberiya min**

**devê xwe ji qurşînê re**

**verkirî ye**

**rûtirş e mîna lalekê**

**li ber riwê min de zindî ye**

**her ku ez li eynikê dinêrim**

**mîna tîrekî di hundirê dilê min de**

**bindavan dikole**

**sikeyên mîtro yê di hundirê wê de çêdike**

**rehjen û pêkenûkan jinav dibe**

**êşan tev dide**

**xwe li ser hespê min ê seqet de**

**siwar dike**

**min bi tayê xemê**

**baran**

**pîzot û xweliyê**
**ve giran dike**

**mîna xanimekê**

**şîrê evînê**

**di sîngê wê de zuhabûye**

**bi min re hevpeyvînekê çêdike**

**bi dawiya şevê de**

**xwe radestî**

**rûdana westandinê dike**

**xurbeta min**

**stranên min ên bi şev û roj**

**bi lingên xwer**

**bi guhên ker**

**dibîne**

**û li ser sehneyê şanoyê de**

**siha min e rawestiyayî**

**xwe dirêj dike**

**mîna çemekî**

**ji destpêka felekê**

**ku bi dawiyê**

**mîna deziya domanê dibe**

## Dûrbînên xeman

li her parçeyên cîgehê

laşek min qutkirî heye
laşên bê xwîn
çavên bê hêsir
dilên bê guh
gewdeyên bê damar
mîna zarokên bê mal
û şevên bê stêr
neqşeyên hêrsrên min

li findeyan digerin
niha di vê gavê de

wekî sala par
an sala berê
an jî sala bê
pirên jihevketî

di nav hizrê min de

tên e sotandin
cêraxên kevin

çîrokên min in
cixareyên vemirî

pêşgotinên

**ji êşên min ên toz girtî re**
**beranberî te**

**çavên min**

**bi dûrbînên xeman**

**li te dinêrin**
**gurçikên nalînên xav**

**dihêrin**
**ji çavên te kûrtir**

**tiştek nîne**

**dema  ewrên tarî di çavê min de**

**nêçîr dikin**
**min ji deştek ta deştekî**

**vediguhêzînin**
**û ez jî di nav bayê rêyan de**

**digindirim**
**zivistanên te direvînim**

**di adarê de**
**bûharên te**

**li ser agirê giyanê xwe de**

**dikelînim**
**rêwî me**

**rênas im**

**di giyanê te de**

**min rê winda kirin**
**karwan li pey min winda bûn e**
**berf jî dibare**
**wekî zinarekî**

**ku ji ezmên ve**

**were xwarê**
**wekî rondikên girs û tirsdar**

**dikevin**
**çêja evîna te**

**wek libê zeytûnê tal e**
**bihinvedana min**

**ligel te cenga dil û hizr e**

**Ey sirûda êtûnê**
**bi min re be**

**mîna tîrêjekî şerê tariyê dike**

**bi gûrmijê lêvan**

**û bêdengiyeke har**
**tenê siha te niha**

**baskên xwe**

**li ser şeva min e lal de**

**dideyne**
**tenê tilî**

**xêzên peyvan derdixîne**

**mîna yekêneyên bîranînan**
**her tişt xewin e**

**va ye tu xewineke zindî yî**

**ava xatirxwestinê vediwxî**

**û dibêjî ev mey e**
**jibîrkirin hogir e**
**tenahî dagirker e**

**efrîniya awiran.**

**Bimîne şad**

**ku dilê min aram bimîne**
**ku kanî rengê xwe**

**li ser giyanê erdê wergerîne**
**şiyar bimîne**

**ku razan xwe ji meloliyê rizgar bike**
**ji derveyî demê**

**findên şevan vêxîne**
**di awazê de**

**cihê te**

**li ser bilindî ritman de berze**
**Volkana dil.**

**tenê dikare evîna min**

**bi dûrbûna te de**

**bixwîne**
**ez û te kanî ne û zozan in**
**paytexta qumrî û Bilbilan in**
**nalîn in**
**dojeh in ji keseran re**
**name ne ji siberojê re**
**hest bê hiş e**
**henas har û dîn e**
**evîna te hêvî ye**
**baranekî li ser helebçeyan e**
**mizgîniya xelasiyê ye**
**serkeftinan dirêsîne**
**adarî tu efrîniya awiran**
**kurdaxiya girnijînan**
**di te nûjiyan dijî**
**nûbuhar diqêre**
**felekê dixapîne**
**rewrewka zaroktiyê yî**
**hola zeyzefûn û beybûnê yî**
**seroka dilê minî**
**min ji zîndanê demê derxîne**
**heyfe ku xulekekî derbas bibe**

**bê ku çavê min te bibîne**
**ku ew ciwantiya bedew bar bike**
**qurmiçk êrîşî dêman bike**
**bê ez tola evînê**
**bi maçeke sor li ser lêvê te hilînim**
**felek tim me diêşîne**
**Çendîn kenê te şîrîn e**
**Ezmana şîn**

**di giyanê te de**

**çendîn heşîne**
**keskesora mestbûyî**

**cihê xwe ji asoyê ve**

**li ser kenarên sîng û berê te de**

**vediguhêzîne**
**mest im**

**serbest im**

**ji bendên hiş**

**rizgar bûm e**
**bin siha kenê te de**

**dimeşim**
**qendîlek**
**di destê min de ye**

**û di destê min e din de**
**pirtûkekî xwe li ber siha te**

**ditewîne**
**bêzar im**

**dilzar im**

**binefşan lêvê min dixwin**
**banga maçekî wêrek dikin**
**ku ji lêvê te derkeve**

**û têkeve ropela axînê**
**min di henasê temburan de**

**bihêle**
**bilûran bigrîne**
**dîlanan biafirîne**
**refên kevokên gûzel**

**ji qefesên dûmahiyê ve**

**derxîne**
**Stonên berêvarê**

**bi hatina xwe**

**hilweşîne**
**heyv û rojê**

**li hev bêne**
**ku jiyan pergaleke nû bistîne**
**serên keseran jê bike**

**xemgîniyan bumbe bike**
**kovanan derxîne**
**raperînan bicivîne**
**stêrkan li ser min û xwe**

**ji ezmanê dilçûyîna xwe ve**

**birjîne**
**di min de**
**hemî jîndar û çerxên felekan**

**tî ne û birçîne**

# Eger

**Weke perwînekê**

**yara min xwe vediguhêzîne**

**xwhdana bin çengên xwe**

**di devê stêrkên xemgîn de**

**rûdike**

**sipîbûna xwe**

**dide ewran**

**tirşbûna xwe**

**dide lîmonan**

**ger derya evîna wê ji min re**

**bidîtiya**

**wê xwe ji bahozê re bihêla**

**eger çiya mezinayî ya wê bidîtiya**

**wê bê bask bifirya**

**wê erd xwe radestî**

**temarekî yekta bikra**

**û bender wê xwe**

**li ser kendalên deryayê de**

**jiyana xwe bidawî bikra**

**eger xemgînî**

**şahiya wê bi dîtina min**

**bidîtiya**

**wê mest biba**

**fêrî kenê wê biba û bimra**

**eger**

**eger ew**

**di hilma wê de bihna baranê ye**

**dema di sibeha nîsanê de dikeve**

**bihna zeyzefûnê ye**

**dema piştî nîvro**

**xwe radestî elesê dike**

**di hilma wê de**

**bihna gulavê ye**

**di peyala nîv dagirtî de**

**hilma sabûna baxkirî ye**

**a li ser tiliyên zarokan**

**mest dibe**

**dema riwên xwe yên nerm dişon**

**di hilma wê de bihna domana**

**a ku ji qehweya -Yemenê - derdikeve**

**bihna ergîleya mestbûyî ye**

**bi baxê sêvê**

**wax**

**wê çawa bax piştî hilma wê bijîn**

**çawa!?**

# Em gîhan

**Ji çavên te de**

**nifşekî nû ji perwînan derdikevin**
**di nav baskên xwe de**

**nameyên sibehan**

**ezber dikin**
**di hembêza xwe de**

**gulan kedî dikin**
**xweziyan dibêjin**
**Şîretên berbangan**

**belav dikin**
**bi te dibim dîlê demê**
**li bendî peyvekî hestiyar dimînim**
**ku min ji êşan bidize**
**lê wek her carê**

**çepelên min tevlî berfê dibin**
**-Çile - dijwar dibe**
**nameyên dilê te**
**dereng li rê dimînin**
**li bendemaniyê de**
**ez û demê şerê hev dikin**
**qirecirên rêyên dûr**
**gengeşeyên derdorê**

**te ji min vedişêrin**
**di welatê me de**

**Evîn bûye nûçeyeke lezgîn**
**nûçeyeke derewîn**
**Soz jî bûne toz**
**lê di kenê te de**
**di dengê te de**
**rastiyekî heye**
**gelo rastî çi ye?**
**di vê tevlîheviyê de**
**hest û hizrên min**

**xwe bi werîsê jibîrkirinê**

**darvedikin**
**ez jî di nav xwe û te de**

**raman dibim**
**hêsirên xwe yên çûyî**

**amar dikim**
**di legena felekê de.**
**Birînên min**

**nanên germ in**
**yên kê werin**

**hevîr in**
**dixwazim di çavê te de**

**siberoja xwe bizanibim**
**ez jî weke payîzê**

**neçar im**
**wek darên zer dinalim**
**çendîn azarîbûn konên xwe**

**li ser buxçeyên dilê min de vegirtin**
**mîna hêsrên zivistanan nawerive**
**dixwazim te ji demê bidizim**
**te ji hembêza tirsê derxim**
**xemgîniyên te talan bikim**
**şaxên hêsrên te**

**wêran bikim**
**Ji te re bibim hêlîn**
**ji bo her gavê**
**ji dilê te nalîn û volkan derxînim**
**te bispêrim xwe**
**te li ser hespê kenê xwe**

**birevînim**
**te ji azadiyê re**

**bikim navnîşan**
**ji çavê te**

**kevokên rengîn derdikevin**
**dem hîn heye**
**evîn hêja ye**
**hêvî zindî ye**

**bedewbûn hîn maye**
**ez jî bi welatê di çavê te de**

**xweş bawer im**
**bi zagonên wê**

**bi reweştê çivîkên**

**ku di çavê te de dijîn**
**bi şahiyê bawer im**
**rebenê tîrêjên ku ji henaseya te tên min**
**ew sûlava porê te li ber min de nasekine**
**geh av e**
**geh agir e**
**Ji te re rastiya min ey keça çileyê**
**Berfa li ser çiyayên min**

**cila bukaniya te ye**
**berfa ku li ser min diwerê**

**ji xemla te ye**
**tu di her derê de zindî yî**
**di nivîsên min de dijî**
**kevinî tu**
**xelekeke tevgirêdayî yî**

**ji şoreşên min re**
**Çendîn kûrahî min gêj dike**

**dema ku nêzî cîhana xwe dibim**
**rastî siha xwe ya dirêj têm**

**ew siha sersar**
**mendal dike êşan**
**mikur nabe ji kesî re**
**ew biyan in**
**bi lez diçin**
**bê guh in**
**kesine dûr in**
**ev cîhana bi tenahiyê xemilî ye**
**serwer e ew tarî**
**ez û te gihan e bilindiyê**
**û şînkayî**

**ji me re hembêza xwe**

**vedike**
**em gîhan**
**di navbera hembêzên min û te de**
**yên tev derbasbûyî bi hev**
**sêv û hinar**

**nû gihan**
**dîlan serxweş in**

**li ser kenê te**

**û buhar gêj dibe**

**ji ber min û te**
**li ser destê te  de**

**wek ku ez mezin bûm**

**wek ku ez berî çend xulekan**

**hatim e jiyanê**
**li jiyanekê bê şer û ceng û doman**

**hembêza te**

**çendîn xweş e**

**kur e**
**mereq kor e**

**agirpêj e**
**li ber cilên te**

**Newroz bi coşî xwe hejand**
**min bispêre**

**berbanga kenê xwe**
**min nehêle**

**li bendemaniyê de bicivilim**
**min radestî**

**wan çiyayên dûr bike**
**min li ser girên memikên xwe de**

**bigerîne**
**li ser çiyayê Agirî**

**Cûdî û Sîpan**

## Endezyara rewanê min

**têm û li min kincê xwedayekî**
**dixwaze ji te fêrî afirandinê bibe**
**windabûn koça xwe ya dawî dike**

**nav tîrêjên çavê te de bar dike**
**min bi şewqê awirên xwe  biparêze**
**bi agirê kenê xwe**

**min bişo**
**stêrkên hûr xelatî şeva  min bike**
**nema dem bê te derbas dibe**
**nema sêwir**

**nivşta sirûştê dipejirîne**

**bi bendemaniya min ji te re**
**bi baskên peyvan re**
**dixwazim bifirim cem te**
**li ber kevîkên gewdehê te de**

**mereqên min diçin û tên**

**wek leşgerên westiyayî**

**ji nûbedariya dem dirêj**
**dem niha ye**
**ji derveyî wê  jiyan winda ye**
**berî te**

**ez mîna bermayîyên cengan**

**belav im**
**bê war im**
**neqşeya min**

**di nav neqşeyên welatan de**

**tev derbasbûn e**
**zimanê min jî fermî ye**
**li warê belengazan de tenê**
**lê ji derveyî xemgîniyê ve**

**şûnwarên min**

**şaristaniyên mirî ne**
**bi balindeyan re**

**hestên min**

**daxwazê hembêzkirina hestê te dikin**
**dibim av**
**dibim sûlav**
**dibim li ser girên sîngê te mey û gulav**
**ewr û sîtav**
**welatî tu ji xewinên min re**
**xelat û nîşanî bi min de**
**em e her tim wekî Dicle û Feratê**
**bi hevgin**

**bi hev re bimeşin**
**evîndar û şehîdên xwe hembêz bikin**

**di xwe de veşêrin**
**û ji wan nifşên gulên buharan**
 **bibişkivînin**

**endezyara rewanê min**
 **welat namire**

**dema ku evîndarên xwe**

**ji dil**

 **hev hezdikin**
 **bi hev re bi ken û dîlan**

 **mirina reş binax dikin**
 **dilê min niha**

**xweştirîn peyv ji te re dibêje**
**tenê serê xwe li ser sîngê min de**
 **sirûda roj û derya**

**keskesor û bê**

**bibhîse**
 **çendîn  jiyan hêja ye û xweş e**
 **çendîn dûrbûna te**

**mîna şeva min reş e**

**em jimêj ve hevdû nas dikin**
**ji berî zayînê**

**û piştî wê**
**bi hevdû re  hatin vê gerdûnê**
**me agir û çandiniyê**

**nas kir**
**me wêje û  evînê**

**saz kir**
**gefên felek û narvînê**

**şermezar kir**
**ji landika zaroktiya te**

**derketim**
**ji malzarokê stran û lorîkan**

**jidayik bûm**
**li ezmanê kenê te**

**firîm**
**û bi bayê payizê re**

**bi pelên daran re**

**bi ba dibûm**
**ta ku min xwe dît**

**li ber pencereya mala te**
**çîrokeke payîzî**

**çendîn navê min girs e**

**li ser lêvê te**
**dema bi dengê te digindir e**

**gûkeke agirî**
**warên dijminên tîrêjê**

**wêran dike**
**bi wateyên xwe hêviyên siberojê**

**bi dest dixîne**
**tenê kenê te**

**bi helbestên min**

**dikare**
**awirên te hestûyên peyvên min**

**ligel kevokên gûzel**

**dabeş dikin**

## Ew

**Berî rojbûna bendemanê**

**riwê giriyê xwe**

**bi xewinên rêwiyan**

**rengîn dikir**

**bêdengiya xwe**

**pêş kaxizê digrînê**

**bar dike**

**mîna pişkojê**

**an**

**tozê**

**ez jê re dibêjim:**

**ey dawiya bîrêkirinê**

**û balindeya seqemê**

**ezê xwe radestî te bikim**

**di nav qerebalixên damarê de**

**û dengên nalînê**

**ezê dengê te bi du hêsran**

**qamçî bikim**

**pey şîniyê te nakivim**

**ta rêwîbûn keser berde**

**min bi avê baranê xwe xendiqand**

**li burcên keserên min de**

**winda dibû**

**ew xewindar e mîna rojê**

**mîna ewrê di nav min de**

**ew!!**

## Şahiya ronedî

Em qet rastî te nehatin e

ey rastî

tu ew leylana bêbend û bedewî

di gerdûnê me de

berve dawiyê em diçin

mîna kûsiyên bejî

ev goristan û penaberî

li zengilê mirinê dikûtin

li dergehan dixînin

di qerebalixê de dimeşin

riwê bêdengiyê

li xwe dikin

ev mirin daholên xwe lêdide

ji lorîn û stranan naweste

mîra min

ji me re ne ew rêyên dûr

**de em li ser de biçin**

**meş felsefe ye**

**girnîjîna te nasname ye**

**ey helbesta har û dîl**

**pîroz e dilê te**

**çendîn şînkayî dida beyaran**

**di helbestê min e sert de**

## Awaza Dînbûnê

**Hêsira min di awazên aliyan de**

**tîpa bêdengiyê ye**

**nalîna wê ye**

**çirûskekî ji baxê bedew  çinî bikin**

**ronahiyê ey avakerê jiyanê birjînin .**

**Ey bayê sîbera tenik**

**xwe rût bike**

**gerdena bîranînan bide min**

**baranek e şîn**

**xwe tevlî dilê min dike**

**li ser kenarên Feratê de dimeşe**

**li benderên reşbinyê**

**derbas dibe**

**Nizanim**

**ji şeva xwe pirsyar dikim**

**li ser vedenga maçekê**

**li ser findên min**

**Xemgîniya me**

**geriyana gulya gîhê ye**

**gerîna bê ye**

**mestbûna salan e.**

**Ey tîrêja ewra dirêj**

**serî hilde**

**sibe cejina me ye**

**li ser baniyan .**

**Mêrgên kesk ên ciwan**

**şiyar dibin**

**westiyayî me weke evînê**

**dinalim**

**mîna berşîrkekî li ser rêyan de**

**hatiye avêtin**

**dem hat ku em helbestê bikin sifrekî**

**evînê li ser rêyên parçebûyî**

**weşan dike**

# Ez Efrîn im

**Di xwîna min e hinî germ de**

**te bi tundî vedişêrim**
**berî mirinekî bêbext**

**ez e bighim te**
**çendîn xwîna min**

**ji ava kaniyên te hez dikirin**
**Siyamendê te yê nûjen im**
**xeca min**
**ne em mirin**
**û ne jî sêwîbûn.**
**Ne ew çûn**
**ne ew êş bar kirin**
**em lawên kovanê ne**
**zarokên nalînê ne**
**evîndarên hêviyê ne**
**hêvî li kurdistanê çarmîxkirî ye**
**hêsirên te qetrana min e**
**û ez êzing û darê rût im .**
**Em besî newrozan in.**
**Agir in.**
**Şewat in**
**Êton in**
**bi te re min xwe dît**

**evîndarekî mîdî**
**eywana min**

**li keleha - Semanê - ye**
**birca min e belek**

**di çavên te de ne**
**nivîna min tixûbên laşê te ye**
**lê çi bêjim**
**eger dijminê evînê**
**buhişt ji dest me bir in**
**berî bimrim**

**ji te re laşê min**
**li xwe bigre**

**keyf û şahiya min**
**qet negirî ji bo min**
**tenê bi bejina te têm**
**Şehîdekî zindî me**
**Mîrava min**
**tenê dijîm**
**dema tu tola evîna min**

**li ser bilindiyê çiyayan deynî**

**dilê xwe li ser dilê min dî**
**bi şehnazî serî hildî**
**ez ne dûr im**
**dûr neçe**
**berê laşek bûm**

**niha jî ez ax im**
**zeytûn im**
**Yarê ez Efrîn im**

**dilbirîn im**

# Ez û tu

**Jê negere**

**ji ber ew mêyatiyeke**

**her nepeniyên birînên derbasbûyî**

**dabû te**

**-Sîheyvê – evîna te ya koçkirî bû**

**di hêsrên te yên penaberbûyî de**

**ji bilî wê diyarî ti kesî ne ke**

**ji ber ku ew yekem kovan bû**

**piştî wê her talbûn vala ye**

**jê negere**

**Sîheyvê - a te westandibû**

**hinek tiştê**

**ku nalînên jiyanê**

**sipartibû te**

**ji bo tu li bilindiyê bî**

**ji bilî çi kesî**

**Nîsan – wek ên din  in**

**seyraneke derbas bûye**

**negrî**

**baskan  bihêle ji dil re**

**dema ku êş**

**tola xwe hiltîne**

**bifire**

**li bendî barana tengezariyê**

**nemîne**

**tolê ji talbûna xemgînî**

**hilîne**

**lihevhatî bimîne**

**bibe mîna avdarê**

**bi destê birîndar**

**agirê vêxîne**

**ji bo bibe ewrê reş**

**xwe netewîne**

**hemî erdhej**

**di jiyana te de**

**wek leylan in**

**ey veşartiyo di pîzotên xweliyê de.**

**Mîna demboriya zikmak**

**serî hildidî**

**pêş demê de**

**dûr dibezî**

**sersariya te ya niviştbûyî**

**bi tenê xwe ranaweste**

**şoreşê vedigerîne**

**tu ne armanca çi evîndarê yî**

**ne xelata biyaniyê yî**

**biyaniya bê pergal**

**bê mêranî**

**çavdêriya mezinahiyê**

**bê reng neke**

**biçe**

**hemî êşan bisojîne**

**bi gûrnijîna xwe ya tekeskirî**

**mîna evîndarekî**

**di rêya xwe  de biçîne**

**di cîhaneke**

**nalîn tê de hatiye jibîrkirin**

**di nav de ti cih**

**ji evînê re nema ye**

**ji bilî hembêza şilîbûna sermedî**

**orsipyan refê herî pêşî**

**di serdema me de girtine**

**dev ji şerpîna hêsran berde**

**dev ji azariyan berde**

**biçe**

**hêdî hêdî bila xwîna te bilive**

**xwe bi êzingên  siberojê germ bike**

**yê wek birîna te bi hilme**

**pêwîstiyên nexweşan pê hene**

**li vê cîhana ku êşa tunebûnê dikşîne**

**cîhaneke bê birînekî rasteqîn**

**bikaribe**

**bizqa te ya agirî bigrîne**

nalîna xwe bide bi kevrekî

qêrîn bike  li ber ritmê awazekî

di bumbeyên dengê te de

ey çiyayî yo

agirê qurşînekê ye

ji çekê şoreşgerekî ye

kifika  felekê  red dike

dev jê bernede

diyarî wê bike

êşa te yî esmerok venemirî ye

metirsiyên wê yên tevderbasbûyî

di xwîna te de venebû ye

ey xwedan mereqên dirêj

Sîroz

hêdî be

netirse

jiyana xwe bi dawî neke

ahîn ne be

bila ti berz bî

hember kesên ku bûn e

dildarên revê

zelal be

sersar be di wan çolên celbkirî

Sîroz ey siha ronahiyê

hemû karwan şerpeze bûn

dev ji erka xwe berdan

ne ma di nav qerebalixê de

meşîn

derbasbûn

qet ne pirs e

ji seyraneke din

ti di nav de biçî

xwe zikmak bike

di kendalên evînê de

ji bîranînan şerm neke

ji wan hovên ku dûr ketin

bûne mîna derewekî lal

di şikefta korbûnê de

**çi birîn li ser birîna te yê sert hilnakişe**

**ne mêrek**

**ne jî jinek**

**bi birîna te re dikarin bibin hevpar**

**guman neke**

**ku kûrahiya te xuya ye**

**lê dûrbûyî ye**

**wek rastiyekê**

**xwe ji çi metirsiyê re**

**natewîne**

**-Nîsan - wêrekiyê nade**

**dostê min**

**Sîroz negrî**

**ji ber yê wek te**

**bi pepûkiyê re nakeve dan û standinê**

**pepûkiya gerdûnekî hêdî hêdî**

**berve wêranbûnê diçe**

**dikeve**

**di dojeha naletan**

**di dergûşa mirinê de**

**di zîndanê tunebûnê de**

**Nîsan mîna her efsanê ye**

**wek evîndarekî û ramannivîsekî**

**hebûna xwe bijî**

**ku xweşikbûnê xelatî erdhejan dike**

**wêrekiyê radestî bahozan dike**

**û başbûnê mîna xelatekî**

**dide volkanên dîlgirtî**

**dîlgirtî lehiyê ne**

**dîlgirtî berfên vêketî ne**

**di dûmahiyê de.**

**Destê te yê rikber**

**mîna xemgîniyekî**

**ku caran ji axdariyê**

**newestabe**

**berve ezmên ve dirêj bike**

**li ser stêrkan de bihêle**

**ji bo birçîbûna xeman bigrin**

**xwe di çavên şevê de bicih bike**

**heyke hilmê**

**bi gûrnijînê te yê arandî**

**ey serwerê birînê**

**birîna ku xwe mezin dibîne**

**li ser nemiriya bendewar**

**ez ne -Dunkîşot - im**

**lê ez di dêmê wî de**

**xemgîniya bavlîsokê me**

**Sîroz çirûskên asoyê nexîne**

**qirecirên giyanê neşkîne**

**dînbûna hilmê nefetisîne**

**nalenalên xemgîniyê newestîne**

**beranberî xeyda agirê**

**bêdeng nemîne**

**sêwira avê**

**di nalîna xeman de veke**

**mîna tîrekî di kezebê rastiyê de**

**bi beze**

**tu hatî vê zemîna dîlgirtî**

**wek ewrekî**

**baranê dike xelat û diyarî**

**Sîroz tu dawiya birînê yî**

**dawiya êşên adamîzadê yî**

**rojbûnî**

**ji xewinên zaroktiyê re**

**bi hêrs bibe**

**hember omîdî yê**

**û ramanbûna berdewam**

**Sîheyv ê tu nekuşt**

**lê tu vejand**

**xemgîn nebe ji demboriyekê**

**xwe bi xwînçûyînê xemilandî**

**xemgîn nebe**

**ji ber ku her yarek Sîheyv e**

**her deryayek -Sîheyv - e**

**her qurşînek -Sîheyv - e**

**her gulistanek - Sîheyv- e**

**hemû birînên me – Sîheyv - in**

**derkeve**

**xeman berde**

**wan ji zîndana herî kevinar**

**ji êşan rizgar bike**

**xwe jî rizgar bike**

**bibe seyrana vî agirî**

**di bilindiya çiyan de**

**qêrînên te yên sermedî bahoz in**

**lêborînê ji xeman**

**ti carî nexwaze**

**ji ser hespê seqet**

**dakeve xwarê**

**nepeniyên hundir veke**

**wan lêpirsîn bike**

**dev ji jinê berde**

**ji ber ku li rojhilata me de bûn e**

**mîna nifta di destê**

**ew kesên ku ji her aliyê**

**hatibûn wê .**

**Mirin di rêyên mayînê de**

**di giyanê me de**

**derbas dibe**

**ez ne – Sanşo – me**

**rêhevalê mişextiya min**

**ez di te de**

**eynikekê ji riweke koçkirî dibînim**

**sorgunkirî ye**

**mîna evîna ku vala em serdana wê dikin**

**û ti cih ji me re nîne**

**ji me re ye ew şevên xirş**

**ji me re ye**

**ew ezmana ku dike fîxan**

**û ji me re ye ew zûhabûna girover**

**ronî mîna jineke**

**dixwaze bi te re bileyze**

**wê şad bike**

**piştre**

**bi ewrên**

**xwediyên gavên çargoşe û sêgoşeyî**

**erza wê bide**

**Sîroz bêdeng be**

**li ser gîhayê bayê rûnene**

**Nîsana qels alava nîgaşê ye**

**kursiyek ji mirineke di rê de ye**

**mîna dawiyekê**

**bi serî û hişê sêwirê dileyze**

**Sîroz ey êşa zozanan**

**xema zeytûnekê**

**rastî ewr û artêşa wê hatibû**

**çima tu axdarî**

**ey nexweşiya avê**

**gora wê**

**bê cejin im ez**

**şînbûna ku bi şeva birîndar re**

**xemilî ye**

**bihin dikim**

**bi qêrînên me mest dibim**

**li ser ritma tembûrê**

**qêrîna xwe distirînim**

**bi tenê xwe**

**di zivisatana tal de**

**dirazim**

**rehniyê distînim**

**di her zemawendekî de**

**xwe vedişêrim**

**li ber her buharê de**

**biyan dibim**

**car ne dibim agir**

**dibim xema domanekî**

**bejina agirê çiyayekî**

**li xwe dikim**

**Sîroz ey darbesta ramanên min ên kevinar**

**û dem dirêj**

**sêwirên vê bayê min**

**çarçove dikin**

**wan dilovan dibînim**

**wan pêşeng dibînim**

**xemilî ne bi xemgînî**

**ji nalîna xwe netirse**

**geliyan henase bike**

**ji bo wê ti serbelayî**

**di vê jiyana nezûk de**

**tu hîn li dadmendî ya van salan digerî**

**navbera te de kelema demboriya rikber e**

**ji bahêlkêşan û henaseberdanê re**

**çepikan lênede**

**ji ber ku her rehjen sexte ye**

**Efrîn jinbiye serdeman e bi te difûre**

**Kobanî jinbiya rêwiyekî ye**

**di nav tarîbûnê**

**li ser bêzariyê ye**

**û xwînçûyîna wê**

**di nav giran de**

**min bi rêve dibe**

**hejandinek heye**

**wê belav dike**

**pîzota serdemên vala**

**li xwe dike**

**Sîroz di gêjbûna feleka zordar de**

**wek te li ser rêyan**

**dimeşim**

**ronahî ya hindik**

**bi buhayekî erzan dikirim**

**bê nirxbûn**

**ji hebûnê re bihêle**

**netirse**

**narvîna me ye**

**ku em bi xemgîniyê**

**mest bibin**

**bibin riwekî ji jiyanê re**

**û gelek rû ji mirinê re**

**êşa dîlgirtî ji pepûkiyê re**

**ez bi tenê li vir im**

**li ser sînorên girtî**

**nûbedarê te me**

**ew rebenê derketî**

**ji perestgeh û quncên beyar**

**ez ew bapîrê mestbûyî me**

**bi zaroktiyekê**

**ku hemî daxwaziyên derbasbûyî**

**serdanê wê dikin**

**de were li ser bilindiyê**

**Sîroz ji bilindiyê netirse**

**ji ber xelasiya me**

**bi çûyîna me ye**

**li ser wan çiyayên şoreşger.**

## Gora çokê

**dûr neçe**

**eger dilê min çû**

**windabû**

**bê hêvî ne be**

**eger dilê te heliya**

**şikest**

**kîma ez nizanim ez kîme**

**ji dema ku min şopa hêviyê da**

**ji dema ku min ji tariyê hez kir**

**Ji dema ku berfê**

**li ser lêvê heyvê**

**çirayên xwe vêxist**

**ez li ser pirê Feratê de**

**rêwîyekim**

**metirsiyên min**

**li ser serê daran**

**digrîn**

**hewldidim**

**bi evînê bimrim**

**li cîhaneke têde**

**dilên ji kevir bicih dike**

**çavên te**

**bedewtirîn daristan in**

**di sihên gewdeha te de**

**daristan û darên kajê ne**

**hilma reyhanê ye**

**deşt û kendal e**

**û zeviyên zeytûnê ne**

**li ser dûmahiyê dirazin**

**belavbûyî weşan dibû**

**li vir tu hîn digrî**

**di hundirê min de**

**di bendemaniyê de**

**xemginî**

**ji temenê me didize**

**tu dimînî**

**mîna helbesta min e birîndar**

**bi hêsirên çavên xwe**

**ên awiran dixapînin**

**ez çok wek xwe**

**dudil dibînim**

**çavên xwe dide pencereyan**

**ji rêwîtiyê hez dike**

**firindeyan ji min re**

**gazindên êşên wî dikirin**

**wî li ser bilindiyekî dîtibûn**

**dema jiyan xwe bi dawî kiribû**

**min li ser rêyan**

**bin axê de**

**gora wî vekûland**

**dilê wî ya ku bi bêdengî**

**keta kûrtan.**

## Rojhilat im

**Ji destpêkê ve evîn hebû**

**tu yara min bû**

**Ji malzaroka viyanê**

**tu hatî jiyanê**

**berî çivîk û baxan**

**berî perwîn û gulan**

**ji lêvên te**

**binefşan çinî dikim**

**li ser quma deryayan de**

**helbestên xwe bi xêz dikim**

**awazên kemanê**

**bi ahînên te dibhîsim**

**parçeyên awazên min mest dibin**

**ey ava mezin**

**ey Ferat**

**ez im ewê yê bi destê xwe**

**li ser avê**

**xemginiya xwe**

**şêwe kiribû**

**ey -Nîl-**

**ava evîna xwe**

**li ser xwîna min de birjîne**

**dudiliya min vemrîne**

**giyanê min li ser lutkeyan de**

**geş bike**

**min te piştî bêhêviyeke kevinar**

**dîtibû**

**xemên min**

**di dûmahiyê de**

**mişext dibûn**

**li asoyan dinêrim**

**firindeyekî dibînim**

**berve jor ve difire**

**bi serbilindî dûr diçe**

**peyvên evîna min mizgeft in**

**perestgeh in**

**têde evîndar ji bo hevdû**

**nimêjê dikin**

**hêsirên wan**

**rehjenên wan**

**bê  kîn in**

**ji bilbil re welat im**

**ji te re Dicle û Ferat im**

**çem û lat im**

**rojhilat im**

## Hêsirê min

**Ev hevalçûka min e**

**kajek û şaxê catirekî bejî ye**

**di nav kokên tûzik û beybûnê de**

**bê pûtekirin**

**an fedîbûn**

**mezin dibe**

**bi êş û hêviyê**

**binyad dibe**

**bê hêviya min**

**mîna sînorên kevinbuyî ye**

**xwar û nizm dibe**

**di dilê min de bekera -Eyşeşanê-**

**dizivîre**

**ey daveka bizqê**

**min hembêz bike**

**penaber im**

**mîna her kesekî barkirî**

**ji derveyî best û deryayê**

**û piştî kêlîkekê**

**ey bizq**

**wê darbesta helbesta min**

**were cem te**

**bi davekên kevinûk**

**bi xemê rezîl û koçerî**

**wê keçek bê cem te**

**sîng û berê xwe ji bê re vekirî**

**wê gavê bêdengî**

**bê xapandin e**

**û mestbûn**

**bê peyal e**

**pişt re**

**helbet wê tu nîşanên nemiran**

**wînî bîra xwe**

**neqşeya min e li ser vî kevirî**

**bîrdanka min jî kevira min e**

**û neqşeya min**

**ev serma ye**

**ev şêlubîliya min e germ**

**Giyanê min**

**şala keçekê sihirbaz e**

**xwedayekî sinêl dixapîne**

**min jibîr neke**

**ey rondika min**

**ey hogira bizqa lanetbûyî**

**xwedanê xem û keser**

**jibîrneke**

**çavên min ên hişkbûyî**

**mîna amêjenên qeşayê**

**di rex fokeyan de**

## Hêsirên xweziyan

**Ey şevo ma ez e her timî**

**dîlê te bim**

**tu di rojeva min de**

**temenekî virmorî**

**ey sibeh**

**ma dilê min bang li te kir?**

**Ronahî mîna rêwiyekî dilzar**

**xwe ji nîgaşên tariyê vedikşînê**

**li ber ve nalîna demdirêj tê**

**cîhana te ya tîrêjkirî**

**xwîna min dixapînê**

**hêsirên min dike qehwe**

**li ser maseyê şevan de**

**şîrovên xemên min datîne**

**giyan jî çîrokên xwe**

**ji rojan re dibêje**

sal jî diçin

leylanên me yên rojhilatî

ranewestiyan

me hîn daneweşandibû

ji dema  me bi hêviyê  re

kaxiza girnijînê

îmze kiribûn

li hember tirs û jibîrkirinê

zor û mirinê

min şoreşên xwe ragihand

ji min re ye cîhana azadîxwazan

li ser zemîna xunavê

ji min re ye sirûda gîtarê

bizqa bedew ê asoyan weşan dikir

bi rêyên ritman

ji min re ye bêdengiya kobanî

û lutkeyên welêt

li cem min cureyên derbirênên niyaz

xwe li ber xewindaran ditewînin

**bi siha avê**

**bi nanê evînê a germ û çeleng**

**û rojê bawer dibin**

**bi çavên bê girî**

**bi çavên te yên ku gerdûnê çira dikin**

**astengiyan jê dibin**

**min çendîn di nav de**

**mîna firindeyekî jiyam**

**li beranberî sêwir**

**baskên xwe vedike**

**çendîn xewin**

**bêriya hêlînên xwe yên kevinar û serdemî**

**di te de dikin**

**ez li newalan de**

**di her çaxê de**

**pirsa wan dikim**

**li bax û hilmên wan digerim**

**pêlên wanî rengîn**

**di nav xwe de dixemilînim**

**şîretên keskesoran pêktînim**

**di newrozê de**

**li ser girê Meştenûrê de**

**li te digerim**

**ez pêleke barkirî me**

**li pey evîn û xewinan dikevim**

**ji dema ku ez şewitîm**

**Roma di şewata xwe de**

**wek rêwiyekî di min de**

**derbas dibe**

**Neyron sermayê xwe**

**di hêsirên min de vêdixîne**

**giyanê min**

**ji zîndanê xwe ve derdikeve**

**li berve rêyan dibeze**

**xwe ji leylanan re dike find**

**êşan di çavên te de pîroz dike**

**ey finda jiyanê**

**ez cîhana xewinê me**
**li ser lêvên zaroktiyê**
**ahîna dengê xunavê me**
**li bilindiya çiyan de**
**strana bin berfa lerzok im**

**awazên xemên te sirûd in**

**li ser milê kaniyan de**

**derbas dibin**

**ma te ez nas kirim?**

**ey mîra cîhana min**

**ku ez im ew ê ku bi şewq ê dildariyê ve**

**hêsirên xweziyan xêz kiribû**

## Hevala min

**Omîdî**

**bê wate ne**
**tîrêjên eynikan winda dikin**
**min dixin xefka aloziyê**
**di hembêza gerdûnê de**
**xwe bi cih kirine**
**emê hêsir**
**mîna xwînê**
**li ber riwên berbangê de**
**birijînin**
**têgehên me neyar in**
**hêviyên me xav in**
**rondikên me beyar in**
**zengelorên me yên pêxwas**
**ji çiyayên xemên me re**
**newal in**
**çendîn kendavên xemgîniyê**
**li ber çavên sermayan**
**xwar in**
**hêsir strih in**
**pelên me yên lerzok şil in**
**hinavên wan sar in**
**ji hemû dergehan**
**çav xeyidî ne**

**hêlînên bîranînan**
**tengezar in**
**nifşên şahiyê har in**
**ji mirinê re kaxeza nemiriyê dinivîsim**
**kenê wî dibihîsim**
**jê re dibêjim:**
**jîndarên te**
**ji paş te ve dêmên te**
**dibirêjin**
**temenên kînên wan li ser te**
**pir dirêj in**
**ta dema ku ez nebûm**
**min vegerîne mirinê**
**bihêle ku ez birînên xwe yên çênebûyî**
**kedî bikim**
**deyindarê stêrkan im**
**bi deynan ve dorpêçkirî me**
**bi hêsirên te ve xeniqî me**
**bi çavên kil mest im**
**çendîn qurşîn evîndarê aştiyê ye**
**dema li sîngê kevokan dikeve**
**bê hiş dibe**
**ji derveyî her qêrînê ve**
**bêdengî peyama xwe dişîne**
**rastiya bê dem dibîne**
**sirûdên pepûkan her car dixwîne**
**gulên rojê diçîne**

**ahînê li ser agirê nalînê dikelîne**
**cengên min ji bo çirûskan dirjîne**
**wekî her hevalekî**
**ji ber xewinekê ve**
**laşê şahiya xwe difroşim**
**te nas kir hevala min**
**ji ber çiye hawar û qêrîna min**
**Emê rojekê**
**ji xefkên wan derkevin**
**li ber dêmên zordaran**
**bi coş êgir vêxînin**
**diranên tirsê bihêrin**
**bêdengiya xwe ragihînin**
**temara gelê xwe**
**ji keçkaniyê bixînin**
**emê azadiyê bikin nan û dew**
**ey keça şîrîn û bedew**
**ji me re ye**
**axa jiyanê**
**bilindiyên Kurdistanê**
**hevalê ey sirûda bilûran**
**çûka ezman û ewran**
**çendîn berf dilê min e xembar birîn dike**
**çendîn serma min dax dike**
**de were em tola êgir**

**ji tariyê hilînin**
**dema meşê em hev bigrin**

**pêdiviya me bi êgir nîne**
**bi werîs jî nîne**
**di nav berfên stûr de dimeşin**
**di nav wan şevên newêrk û bê zirav**
**bibin nûnerên sîber û gulavê**
**ji baranê re tu romanî**
**ji şoreşê re tu volkanî**
**ji min re helbest û ramanî**
**destê te mîna ronahiyê ne**
**min belav bike li ser aliyan**
**axdariyên min têxe bin axê**
**ligel pirtûka xwe**
**min ji min azad bike**
**ji derveyî demê**
**mirin û zayînê**
**min carek din bîne**
**cîhan di çavên te de**
**çendîn aram û şên e**
**hevalê ey qêrîna min a dîlgirtî**
**were em vê şewatê bişewtînin**
**vê ciwantiyê bidizin**
**mîna berfê li ser bilindiyan bijîn**
**ji bajarên mezin**
**û lanetên avahiyên camkirî dûrkevin**
**ji cadeyên orispiyan dûrkevin**
**bayê siruştê bi me kêfxweş e**
**were em xwe tevlî bê bikin**

**were hevala rêya min e  dirêj**
**were em di ezmên de**
**bifirin**
**hemû bask û bendan**
**bi tundî bibirin**
**dûr bifirin**
**dûr bifirin**

## Kênê te

**De bide min kenê xwe dilsoziyeke yekbar**
**di serdema xemsar**
**bide min hembêza xwe**
**axek e sor**
**giyanekî kûr**
**min têxe bûxçika xwe û bigerîne**
**min ji qefesa mirinê derxîne**
**ji bo bibim jîndar**
**bê te nayê min ew buhar**
**şîn nabe di min de gul û dar**
**ji roja ku min tu naskir**
**vebûn li ser dilê min nêrgiz û şilêr**
**û di hundirê min de**
**derketin kanî û rûbar**
**dema ku çavê min bi kenê te ket**
**di hizrê min de avabû bingehên şahî**
**li ser xalên bîrêkirina min de**
**rondikên ezmanên berfîn belav bûn**
**û di cîhana min de her**
**ew helbestên tengezar diaxivîn**
**ku bi te xwe rizgar bikin**
**û di hembêza te de bibin cîgeheke aram**
**ji gulxan û gulîzaran re**
**destê min li tiliyên te digerin**

**di seqema sar de**
**tenê ez rastî leylana te dibim**
**min gelek di bîr de**

**tu ezberkirî ye**
**min te di destanan de xwendî ye**
**di nav xwe de hêvankirî ye**
**hişê xwe bi te birî ye**
**di xwe de dîtî ye**
**di nav agir û berfa dûrbûna te de**

**mîna gokeke berfîn**
**digindirim**
**dengê te zengila zayineke dereng mayî ye**
**di destara mereqên xwe de**
**dilê xwe dihêrim**
**ku hêdî hêdî ,fêrî evîna te bibe**
**cîhana girs çiye bê te**
**welatê bi nav û deng**
**serweriya bi hêz çiye bê te**
**tu nînî azadiya min**
**ez mîna pêla azadîxwazan**

**têm li ber te**

**ji bo kursiya dîrokê bişkînim**
**û xweda ji ezmanê ve**

**bênim xwar ê**
**ji bo yeksan bibe bi jîndar e**
**dema ku her tişt**

**mîna dilê min bi evîna te bibe sipî**
**wê demê bindikeve bêbextî**
**serdikeve doza evîndar**

# Keriyên bê

Ewr ji dikanên ezmên ve hatibûn xwarê
çarçevên şilbûyî

ji xuhdanê gewdeyên du evîndaran e
ji mêyekê hingiv û xwîn jê weşîn
ji mêrekî repkirin ew westandibû
ev sirûda pêşveçûnê ye
çarenûsên me temam dike
di me de giyan vejîn dike
omîdiyên hayînê saz dike
min bêxewiya xwe temirand
tariya xwe vemirand
min agirbestek bi mezinayî re danî
qurbanên êgir hilda
ta bê li ser xwîna me razî be
ji pozên me yên bilind re
pergalê herêmên
yên serên xwe

dijî zordariya dojehê
hildabûn
min çarçevên şilbûyî

bi lehiya evînê

**çûyîna avê spas kir**
**cejinên dîbûnê pîroz kir**
**erza kubariya mozên reş da**
**wan vwxwendî şîva mirinê kir**
**ev buhara**

**bêdengiyê ji cergê tirsê**

**derxist**
**di me de êjdeha qêrînê**

**şiyar kir**
**de ey keriyên bê**

**bersiva zengilên ezmên bidin**
**hêvî ji pevçûnên jiyanê**

**xwe da aliyekî**
**xwe ji navên me**

**rizgar kir**
**qatên zemînê**

**dojeh û asîmanê hêla**

## Li ser kenarên aramiyê

**Şev hêsiran dide hev**

**xwe li ser hevdû kom dike**

**mîna awazek e bazdayî**

**dil mîna stranê cot dike**

**tiliyên xwe dike şorbeya mirinê**

**dem berve valahiyê diçe**

**toza pirsê dalêse**

**li ser pişta gerestêrkê**

**pêkenokên xwe yên zuha belav dike**

**bê ku guhên xwe bide şopên penaberan**

**yên ji welêt derdikevin**

**welatekî axînê hembêz dike**

**ji pezên xwe re zengilê lêdixe**

**û ji şivana re qurşînan berdide**

**cureyên dojehê**

**li ser tabûrên xwedan rihan**

**dabeş dike**

**ên kêrên xwe tûj kirin**

**û gotinên xwe yên şîrîn**

**bi bandor kirin**

**li ser zewacê pirjinî**

**li ser ew kesên ji ol derketî**

**kesên barkirîne buhiştê amar dikin**

**dînîtiya wan**

**li ser tabloya dînan ezber dikin**

**çîroka binaxkirina buharê bi xwînê fetistî datînin**

**ji mirinê re li cem keriyan de bextek heye**

**û ji birêzan re**

**nalînên qehfan**

**pepûkiya axînan**

**di kokên xemê de**

**sihên wan ademîzadên ên xwe mîna ewrekî biyan dixirxirandin**

**xewinên xwe piştî mirinê şêwe kiribûn**

**di ketin bîr**

**buhar nankoriya xwe diyarî wan kir**

**ji wan re çavên gulan**

**şahiya koleyan e**

**ji kokê xemgîniyê re**

**pergala pîzotê ye**

**dema nepeniya xwe ji dil re dibêje**

**cadeyên min xema rojava**

**kovanê rojhilat derbas dike**

**li ser xewinên lorînê dinivîse**

**bi aştiyê dirame**

**tevî ku di penaberiyê de ye**

**û bi şahiyê dirame**

**tevî ku hatiye kuştin**

**ew keçeke cadeyên xemsariyê**

**derbas dikir**

**banga xwedayekî di hundirê xwe de dikir**

**giyanekî xwe ji hestî û çavan re**

**ditewîne**

**ey mirov**

**ji amarkirina kînên te re**

**dem binkeft**

**nalîn jî carek din tu dizî**

**cîgeh û dem dizî**

**ta tu mîna kacê biwestî**

**berve wî biçe**

**wî bixwe mîna ku li te dimeyzîne**

**li ber  wî de ew nalîna newêrek**

**mîna çiyayên hişmend xwe berz bike**

**bibe ew mirov**

**çendîn evîn girs e**

**çawa me wekî qamkurtekî**

**dike pêş xwe**

**bi kel û girî ji me re dibêje**

**hûn mezin nabin**

**mezin nabin**

**ey genimê xapînok**

**zikreşiya xwe li ser min rake**

**ez nema ji rengê zer êdî hez dikim**

**li ser kevîkên aramiya bêhiş de**

**sêwirek zîrek**

**derbas dibe**

**xwe ji asoyê re**

**ditewîne**

**li argona ramanê**

**digere**

**li ser zemîna girs**

**xwe bi ramanê mezin germ dike**

**ji bo bi tenê nestire**

**li ser kenarên nîgaşa bumbekirî de**

**ev sêwir derbas dibe**

**li ber kevîkên çema porsipî de**

**dilsar e**

**mîna welatekî bi êşan dudil e**

**di elendê de gewriya xwe didaqurtîne**

**henaseberdana xwe piştî sibehê dihêre**

**di demê berêvarê de**

**aşka xwe cot dike**

**bi gemiya şevê re dikeve bezê**

**bihnên xwe dikşîne**

**mîna rebenan**

**li ber aramiya bêhiş de distire**

**hest wî li ber xwe dibe**

**şermiyê wî birîn dike**

**riwê nezaniyê ji bêhişbûna wî dibe**

**ev sêwir**

**dergehên koçkirinê li xwe dike**

**dema xwe ji asoyê re ditewîne**

**li dij zemînê radibe**

**argona ramanan**

**li ser kenarên aramiyê**

**vêxistî dihêle**

## Mîna davekî

Dema mîna davekî
hêsirên çiyan

li ser riwên binefşan de diweşînim
bi tirsê hest nebe
hemî dîwar û pencer e

ji te re vekirî ne
ta ku tu ji nav de xwe bighînî min
ji paş an ji derên derizî de

werî cem min
bi çiqlên darê bawer be
me sozên xwe  bin de nivîsî
bi qerenfîlê bawer be
em du qerenfîl in
êşên buharê

li ber dihejin
ey nazdarê mîna bê
mîna te me ez
sirûdên tengezariyê bi lêv dikim
û bêdeng dimînim
hemû şewat

tevlî dudiliya min dibin
hemû xewinên me

**dijî me tevdigerin**
**xwe ji giriyên me re natewînin**
**de were piştî vebûna gulan**
**berde sêwirên tirsê**
**were em tirsekî**

**ji xwe re biafirînin**
**em herdû şahid in**

**li ser rojbûna evînê**
**em li ser lutkeya zengelora dînbûnê**

**bicih dibin**
**bi xwêya hêsiran**

**xwe dişon**
**ta baran bidawîkirina xwe rawestîne**
**ax ji çavên min ên**

**timî tiştan dişopînin**
**azarkêşan dişopînin**
**çareyekê ji xwe re nedîtin**
**biryarekê dan**
**ku êşa xwe paqij bikin**
**belkî razin**
**wax ger çavên min razana**
**wê min ji bûnên wan**
**firindeyên kevokan bigirtana**
**ta wan şah bikirana**
**ji bo li ser dengê tank û bumbeyan**

**şiyar nebin**
**wax gulîstana min**
**çendîn ji her tiştî westiyayî me**
**li hezar merhemetî digerim**
**li darekî girs û bilind digerim**
**ku li binê wê de**

**bi derbasbûnê deman de**

**xew bikim**

## Nameya Hêvî

**Bişkînin bend û baskan**

**radestbûn û bêzarî**

**rakin ew deng û bêjin**

**bimre tirs û azarî**

**dem nîne ji ax û fîxan**

**rabin ey gelê Arî**

**ew şervanan di her çaxê**

**hligirtin tev vî barî**

**berdin terzê reşbînî**

**ti sûd nîne ji xembarî**

**ew xaka pîroz û berz**

**wê azad be bi vî şerî**

**Efrîn gelê serhildêr**

**hest û raman û bêrî**

**warê Arîn û Cudî**

**qet bernadin vî warî**

**Hêvî doz e û rêbaz e**

**reng û xemla her karî**

**jîna  me vîn e û hêz e**

**hember işkence û zorî**

**ranaweste pêla girs**

**li ber wêranî û çavsorî**

**Efrîn dengê bê hampa**

**ew qêrîna cangorî**

**emê rojek hembêz kin**

**binax kin  ala tarî**

**çete û dovên wanî pîs**

**tev wan têxin di yek gorî**

# Nameyek ji Ehmedê xanî re

**Meyfiroşo dûr biçe**

**em bê mey mest in**
**ji roja ku hatine jînê birîndar laş û hest in**
**hemû peyalên meyê ji min dûr bixe**
**ku êş li ber çavên me**

**hertim berz be**
**li ber leylana min tu yî Xanî**
**bi rewşa me ya îro qet nizanî**
**em man e dîsa sêwî û bê war**
**derketin ji welatê belengaz û hejar**
**şopê şehîdên me**

**li her deşt û kendal**
**wê çi rabike ev dilê kal**
**bindestiya me ey Xanî**

**çîroka roj û sal ê**
**bi kûrbûn**

**ceger û hiş dinalê**
**xwedawendî bûye ji me re**

**derd û nexweşî**
**û her diçe dem**

**zêde dibe ezezî**
**Efrîna rûbihuşt**

**kete destê dijmin û komên dizan**
**Kerkûka bedew**

**bû mêrga Turkmen û dûvên meleyên Firsan**
**çerxa sitemkariyê**

**li me digere her dem û her gav**
**narvîna bê nirx**

**bûye ji me re hogirek bêbav**
**çendîn welatên girs**

**ji hev re dibûn dost û yar**
**kurd berevajî wan**

**her diçin dibûn parepar**
**ji me îro sed mîr û padîşah**

**peyda dibin**
**lê di bin dijmina de**

**tev digerin**
**ji wan re cemawer**

**çepikan lêdidin**
**xwedawend dibin**

**her dêw dibin**

**alîgirên wan jî sofî û reben in**
**ji hezkirin û yekrêziyê dûr in**

**bûne leşgerên xelkên biyan**
**derdê me maye ew nezanî**
**li ser wê jî fêrî me dikirin rebenî**
**nirxê pênûsan**

**li cem wan erzan e**
**barê zanyarên me**

**sed qat giran e**
**ger rê veba li pêş ronakbîran**
**rexne biketa hizr û bîran**
**wê azadî li welêt vejîn ba**
**barê bindestiyê li ser me raba**
**ger em wek kurd tevnegerin**
**ger em dijî doza xwe bin**
**wê sed Xanî werin sotin**
**wê sed Cegerxwîn werin firotin**
**ger nasnameya kurdî nebe**
**keda me wê bê sûd here**
**warê me wê hêdî here**
**Efrîna me venagere**
**ey Xanî derdên me pir in**
**Kurdistana mezin bir in**
**dagirkerên kurdan li ser in**
**ger me dikuştin bi navê islam**
**kurdên resen qir kirin bi hêsan**
**namûs firotin di mezada guran**
**hildan li ser me barê tunekirina wan**

**me cîhan xelas kir ji terorê**
**lê bi hebûna me nebûn mikurê**
**di meydanê de şervanên me wêrek û har in**
**lê li ser maseyê**

**xemsar û pepûk û jar in**
**ma ne şerm e kurd ta îro bê hevsar bin**
**pêkenoka ereb û firs û tirkan bin**
**em pişaftin bin navê biratî**
**em parçe kirin bi ol û eşîrtî**
**em hatin winda kirin di nav çar dewlet**
**parve kirin me serxet û binxet**
**rast e em ne kêm zane û agah in**
**di holên cengan de dilêr û serwer in**
**lê ol û sofîbûnê em hîştine li paş**
**keysbaz jî bûne rêgirên karên baş**
**ger em li ser ramana netewiyê rawestiyana**
**armanca gelê xwe bidîtana**
**wê Amed û Mehabad bibana cêwî**
**wê Qamişlo û Hewlêr nemana sêwî**
**meyfiroş peyalên xwe yên tozgirtî rake**
**jiyana me bi tevger û hêz û lebat e**
**ku Kurdistan ava nebe**
**ez kê çikim bi xweşiya gerdûnê**
**ey Ehmedê Xanî tu her zindî dibî**
**wek serxebûn**
**peyvên te yên dagirtî êş**
**naçin ji me, bûne hebûn**

## Nameyên êgir

**Hezar çîrokên agirî**
**li hember pariyên nên**
**serên xwe hildidan**
**behsa xweziyên derbasbûyî**
**çîroka yekbûneke beravêtî dikirin**
**li warên ku tenî tê de serwer e**
**şewat padîşahekî serdest e**
**ewrên sibehan li ser berêvarê**
**têr digrîn**
**ji asîmanên hêsirên xav re**
**çîroka birînek e kevnar dibêjin**
**xemgîniyê**
**li ser çavên çeman dibrêjin**
**birçî ye agir.**
**bazarên kînan li ser laşê gênim vedikirin**
**peykerên rûreşan saz dikirin**
**narvîna reş dibêje :**
**pepûk çiqas konên sipî vegrin**
**lê rengê dûpişk û maran**
**di bin de nayê guhertin**
**ne gur dibe berx**
**ne bizin jî dibe xezal**
**wisa agir demsalên nankoriyê**
**li ser belengazan dabeş dike**
**pêşangeha birçîbûna bê sînor ava dike**
**pistepista penaberbûyî**
**xwe bi werîsên belangaziyê sêdar dike**

**nepeniyê belav dike**
**firtikên biratiyê bi diruşmeyan**
**li warên beyar de weşan dike**
**birûska birîndar dinale**
**bi devekî zuha barana nehatî**
**bi destarê êşan ve dihêre**
**nanê gengaz difroşe narvînê**
**qurmiçkên dojehê li ser rehniyê şêwe dike**
**roka dijwar bi xwe ve asê dike.**
**dengê kevokên sipî**
**li ezmanê welatê min tê qirkirin**
**namûsa ewr û stêrkan tê firotin**
**genima şîn li ser sîngê zeytûnê de tê kuştin**
**şorên axdariyên me**
**nivîsên me**
**bê çav tev digerin**
**li ser pira dîrokê pêxwas digerin**
**temenên winda binax dibin**
**perestgehên kîndaran bûne baregehên mirinê**
**marên heftreng kedî dikin**
**de bese tundirewan biçêrînin**
**keriyên kuçikan xwarin bidin**
**ji roja roj ve neyarên sifreyên me ne**
**ji wan re tunekirin merhemet û derman e**
**nankor û neyar qet ne bira ne**
**bermayên rovî û gura in**
**birînên dîlgirtî lal in**
**heyv diqêriya**
**ji bo evîndarên xwe yên peyalên binkeftinan**
**li ser hevdu digerînin**
**zinaran bi xwe ve girê didin**

**lanetan dikşînin**
**peyalên meya azadiyê digerînin**
**bi tenê baranan vedixum**
**hêsrên xwe yên pirbêj dirjînim**
**li ser stêrkên rijî hildikşim**
**ji bo şopa xwe bibînim**
**dengê ceh û genim ezber dikim**
**berî bibin tenî**
**li ser pira hêrsan dimeşim**
**ku refên perweran rêxistin bikim**
**zendên hesinî şiyar bikim**
**ta agir li ser bêbextan bibarînin**
**hêlînên netewperstan bisojînin**
**siberoja kurdistana bi çûk biafirînin**
**ji bilî jiyanê mirin heye**
**vîna me radestbûnê napejirîne**
**emê bablîsokan ragihînin**
**pirtûkên tozgirtî bişewtînin**
**de werin em ferhenga rojbûnê daner bikin**
**gulîstana nemiran hembêz bikin**
**Rojava ji êgir dûr bixin**
**zeytûna birîndar av bidin**
**sozê pê re nû bikin**

## Navnîşanên tagirtinê

xewinên me
dergehên hacîreşkên jihevketî dikutin
sêv ji zeviyên me yên tewandî ve didizin
tîp li ser sêdaran de
fîxan dikin
cil bûne berqemtên xwînê
li odeyên çarekirinê de
gazî dikin
cinav ê bi hezar taybetmendiyek e kirêt ve
hatiye bi navkirin dixwîne
hindek valahî heye di ezmanê sert de
li wir ne dilovanî
an lehî erdê lanet dike
qehfên qutbûyî di hundirê avtezîna laş de
li xestexaneya niştîmanî de
nimêj dikin

**û orispiyekê bin godoşekî de**

**li nivîna narînî de**

**verecfîn dibe**

**ev kelagiriya guran e**

**li welatê min e rawestiyayî mîna A**

**li ser devê erdhejê de**

**bi hovîtî**

**bajar derbas dibin bi nepenî**

**ji mirinek ta mirinekî de**

**wêran dibin**

**welatê min bê ezman e**

**maçên nerm tund dibin**

**maçên qehbeyan li dûr welatê min de**

**sûreta -Elfetih - dixwînin**

**keriyîn beredayî**

**li ser laşên bûş diçêrin**

**laşên şivanên qunek**

**ên erdê firûtin ji kesê nehêja re**

**mirin li ser kurdistanê dinale**

## Nîgaş

jiyanek dijî di nava giyan

wekî rengekî

peyvekî

hizrekî

bi navê evînê

kûrahiya vînê

dîsa saz dibe

di ezmanê berfîn

di dil berz dibe

vedenga  te tê min

wekî pistepistên şeva dilrevîn

kevokên buharê

dinalin di min de

dema em bi hev re dimeşin

ligel te hemû tişt

dibin wek nîgaş

# Rêwîbûn

**Fermiskên te giran in**

**pişta dilê min êşandin**
**dema ewrên çileyê**

**ji giriyê radiwestin**
**ey dûmahîka bîrêkirinê**
**kotrakûviya seqemê**
**ezê bi bêjerê te ve**

**ta dawiyê bême dagirtin**
**mîna qerenfîla ewrê serî hildim**
**paş zerîya porê te ve**
**ji derveyî te melevaniyê nakim**
**ji ber di kendavên te de**
**tişt û heta gerestêrkan jî**

**avjeniyê dikin**
**ezê rojbenda xwe**

**ji verestinê şiyar bikim**
**wekî bazdayekî ji gavek e destpêkî**
**ezê kenê qirecirê**
**bi berkenê xwe yî berfireh û bi omîd**
**binpê bikim**
**evên tiliyên min in**

**li ser sîngê te de**
**êşên ewran seh  dikin**
**evên rêzên dilê min**
**awazên azariyê stran dikin**
**Ev e elfebaya min**
**zayîna keça zimên radigihîne**
**ey jina zemînê**
**di çavên te de ez melevaniyê dikim**
**ey bêvilbilindiya derhozê**
**neviya ezmên**
**ez ji feleka striha xemilî**

**bi xelatên stêrakan ve**
**hêrsdar bûme**
**paş xêzên hişiyariyê**
**xwe vedikşînim**
**pêşiya berbangê de**
**an êvarê de**
**bi destmala xwe amajedan dikim**
**bi livandina xwînçûyîna xwe**
**jivanên giyanê**
**an nîşanên rêwîbûnê**
**dinivîsim**

## Pêgotin

**ez darê pirsiyar dikim**

**ma rast e**

**we fêkiyê dabû !?**

**ma birûskên narvînê**

**rast bûn !?**

**ev hilma ku ji min**

**mîna êgir difûre**

**ji dilê min**

**niviştê diweşîne**

**ey buxçeya hestnerm**

**a min radestî bê kiribû**

**bîrêkirin..**

**ji ber te dinale**

**baran ji bo te digrî**

**bihna damarên min**

**di te de ne**

**çawa tu hatî sotandin**

**ez hîn ji te**

**libek dû libekî**

**dikevim**

**siha bapîrê min ê repkirî**

**pêş bejinê te neçû ye**

**ey buxçe**

**baran hildiweşe**

**ji nav şewatên min**

**rabe**

**mest bibe**

**tu qet neşewitî**

**ji bilî şeytanê şewata li ber mirinê ve**

**tiştekî neşewitî**

**sihên min li ber te westiyan**

**li nav sihên daran ve dikin kel û girî**

**gavên rojan westiyan**

**paş domanê vekişiyan**

**tu hîn demsalekî merdî**

**li ber danûstanê sêwir bi domanê re**

**tu ew hizrê dagirtî dîmen**

**di giyanê min de**

**stranekî ji bûkaniya leheng**

**û bîrdankekî heta kevir**

**di nav xwe de**

**wê ezber dike .**

## Pêla evînê

**Emê li dora gerdûnê bifirin**

**giyanên xwe weşan bikin**

**mîna nameyên evîndarên windayî**

**hêviyên xwe bi rêyên peyvan weşan bikin**

**volkan êrîşî me dike**

**ji ber çi mirov evîndarê xemgîniya xwe ye**

**ey firindeya min**

**qêrîna min dubare bike**

**ji germbûna sîngê te**

**welat afirî**
**ji hizrê kaniyan**

**ramanek e nû derketî**
**li welatê sermayan de germê difroşe**
**lêv gir e xewin**

**mîna maçên resen**
**çav hingivî ye mîna buharan**

**di hembêza binefşan**
**ezê li ber te**

**ta dawiya stranê**

**dergeha xewinan bim**
**riwên baranê**

**Ji te re biafirînim**
**ta bilbil neçin ji bajarên zuha**
**û niyazî bimîne li warên buha**

**kesekesor im**
**li ser tixûbên sîng û berên te**
**perwînan li ser zendên te kedî dikim**
**nifşên stêrkên nû**

**li ser pişta te de xwedî dikim**
**kelehên tîrêjê li ser gewdeya te**

**binyad dikim**
**sîngê te cîgeheke kevnar e**

**ji evînê re**

**berbang jî ez im**
**welatekî penaberbûyî me**
**sînorên wê tu yî**
**li ber bayê kor**
**hêsirên berbangê**

**li ser porê te de**

**xwe birêve dibin**
**giyanê sibeha nerm e**

**mîna dengê te ye**
**şev jî bi dûrbûna te**

**hunandiye**
**jibîrkirin kal e**

**bi tenê di şikeftê hembêzên me de**

**gênc dibe**
**min xemê xwe**

**li ber dîdara te**

**asê kiriye**
**keser bi werîsê hêviyê**

**girêdayî ye**
**peyv dergeh in**
**bend kelepçe ne**
**demborîn bê heval e**
**mîna narvîna kurdî**

**bê nasname ye**

**pêla te ez ji kenarên deryayê ve**

**dûr xistim**
**ey navenda evîna arî**
**gerdena soza sermedî**
**buhişta rûnedî**

**warê bê xwedî**

**stêrk vala di jiyanê de**

**cihê xwe di ezmên de vedugihêzîn e**

**ji paş temara bedewbûnê ve**

**nalînek dikeve xefkê xewê de**

**di gengeşiyên rê de**

**hêsir xwe bi çirûskên rijî dixemilîne**

**sirûdên tunebûnê daner dike**

**gerestêrk bêdeng e**

**awaz di gewriya qerebalixê de winda ye**

**tirş e evîn bê omîdî**

**bê cil e di penaberiyê de**

**narvîn har e**

**azadî bar e**

**şoreş ferman e**

**ji rastiyê re du rû hene**

**yek jê gula berfê dipişkive**

**û a din jî jehra dipûşkê jê derdikeve**

**dîrok kort e**

**şahî kurt e**

**heznekirin doz e**

**helbest jî şoreşgereke hov e**

**hilkehilkên wî**

**sirûdên pepûk in**

**bê bav e doman**

**dema pirsên teniyê**

**li ser eniyên me xêz dike**

**hêvî riwê ajalekî ye**

**guhê kerekî ye**

**mîna zarokekî bê hiş e**

**ji zikê geşbîniyê derdikeve**

**ez û yê beranber**

**nabin yek rastî**

**em du dêm in**

**li ser rê dipijiqin**

**ji tirsa mirinê ve gengeşiyê dikin**

**pirsan didin hev**

**bersivan dixwin**

**bihaneyan didoşin**

**şîrê demê çêdikin**

**serî hildidin mîna evînê**

**di holên mirinê de**
**dixwazim te ji her tiştî**

**azad bikim**
**ji êş û kovanên bê fedî**

**te rizgar bikim**
**li ser te bim mîna gemiyekî**
**ey pêla deryayê**
**xwe li ser te bibim û bînim**

**mîna ba û dar û gîhayê**
**bi maçekê rengê te biguhêrim**
**xwêdanê ji sîng û dêmê te ve bifirînim**
**nifşek nû ji maçan**

**li ser girên te biafirîn im**

**rehjenên me stêrkên rêwî ne**
**lêvên te buxçe ne û kanî ne**
**têde jiyan pêxwas**

**sêwî digere**
**têde xweşecanî gulan diçine**
**hêviyan hevdide**

**şahiyan difroşe**
**xewinan tevdide**

## Perwîna min

**ji xunava bêdengiya te ve**
**gîha dipeqe**
**şitla behîvê**
**di nav neynûkên te de**
**qels dibe**
**de nerim be**

**li ser şitleyên mhemediyê**
**di bûçxeya xwe de**
**sirûda binefşan ji nêzîk ve bişopîne**
**ev hebûna**
**çendîn evîna wê me westandibû**
**li qeyseriyên serdeman de**
**li me digere**
**ey dîdariyên awazê**
**di sibeha zû de**
**û bihna qehweyê**
**di nîvê şevê de**
**em e wîçûçe û bi pel bibin**
**li pey reşîşkan bikevin**
**bila kesên li erdê**
**bi dengên qurşînan**
**mijûl bibin**
**xewina me ji me re ye**
**em qet şiyar nabin**

**di porê te de riwê xwe berdidim**
**ji ber tu ezmanî**
**hezar bejinek ji bê re xêz dikim**
**û di gewdeya me de**
**karwanên catira bejeyî**
**kivan dibin**
**Zagros lutkeya me ye**
**laşê me yê winda yî**
**bi şehnazî li Torûsê de mest dibe**
**Eştar bi hezkirin**
**tiliyên Enahîta kwaş dike**
**mîna miskê**
**di nav helbestê min de difûre**

## Pêveçûn

**Mîna giyanek e veguhêztî**

**di nav ferehiya cîgehê de**

**tu û siha min û ne ez**

**rûniştgehên debeng**

**virmor in pêş asoyê**

**Zerhimî di hizrê min de**

**xanenşîn dibe**

**rûtirşî di dîmena pêveçûnan**

**dilop dike**

**li dema ez û vekişandina roniyê**

**di cîgehê de**

**Dem  li qurzîkên tenahiya dîkil de**

**winda dibe**

**û cihê te ey rûqayimê**

**wekî bayê rûtirş**

**di kakilkê nişkivînê  de ye**

**dengên xwînê di nehişbûnê de**

**coş dibe**

**neqşeyên belavbûyî**

**di teha nemifayê de**

**Gokekê lingan têwer dikin**

**nizanin çi li paş henaseyê de heye**

**dîmenek e bêdeng**

**û hin dîmenên nêne temamkirin**

**çi li paş sipîbûnê de ye**

**ji bilî te**

**ey tozgirtiyê bi belawliya êşê**

**bi sirûdên demborînê**

**û bayê dîlbûyî de**

**tu dorpêçkiriyî yî**

**di tariyê de felcî bûye**

**berkenê xwe**

**di firaxên mêrgên ciwan de rûdikî**

**te ronî da ye**

**di nîvê zerhimiyê ezmên de**

**nepeniye tu di vê asîmanê de**

## Qêrînên mêwa

**Ev feleka nepejirandinê ye**

**rişidbûnê ye**

**ji dildaran re**

**dilêrbûna azadîxwazan ne**

**di dilê me de buhar**

**bi nivşta xwe  destpê dike**

**di gavên me de**

**çirûskên êgir dilerizin**

**di dilê me de sibehên nerînê hejîn**

**ji şeydabûnê pêlên deryayê**

**mest dibûn**

**Ji kevinê dîrokê ve**

**tîpên me digrîn**

**qêrîna helbestan**

**di me de dimrin**

**li ser kenarên hêviyan**

**wek evîndarekî hatim te**

**li  ser vedenga seyranê**

**evîna min e agirî ye**

**qereçiya min**

**rehnî li ber bejina te**

**xwe tazî dike**

**bejina te ya dirêj**

**mîna darqesebê**

**di elendê de**

**li ser piyê berêvarê**

**helbestên min digrîn**

**di tariya ramanbûnê**

**roja min tê pişaftin**

**li ser nalînê**

**gemiyên min derbas dibin**

**bi lez li ber çavan**

**winda dibin**

**nîşanên xemên min**

**pistepistên bilbilên min**

**cêwîne**

**ev hebûna**

**nepeniyê wê bi min de ye**

**bi rodan û biveyan dagirtiye**

**ey hêsira min**

**ji dema ku tu bûyî**

**zivistan bû**

**ji şoreşa sor re**

**wekî evîndarekî**

**ji yasemînê re**

**xwe ditewînim**

**gavên wê bê hişyarî diçin**

**di cîhana min e sermedî de**

**birîna çîrokê ye**

**pêwîste ku em bi hindek sersariya xwe**

**serbilind bibin**

**heta em hêjabin**

**zengelorên firindeyan**

## Qêrînên roniyê

ji nalîna dar û tariyê
ji bêdengiya te yê

li ser milê heyvê de çekirî
agir mîna çirûskê bilêv dikim
mîna meyê

di çavên te yên hingivî de

vedixum
di sîngê te yê sipî de
hilma ax û rokê
av û qerenfîlê bihin dikim
lêvên te yên sor
mîna xwîna min rêz dibe
bi azadî dilive
agirên te yên sipî bi min de vêket
berkenê te ez şewitandim
ax çendîn min ji çiyan hez dikir
ji gewdeyê te ye
û deştên Efrînê komareke girêdayî ye

ji yekîtiya baxê di henaseyê te
ji şewqa leylana te yê derbasbûyî

li dûr kobanî
û ji wir ve ta stêrkan
ji verecfîna mijangên te
destanên sirûcê
êvarên evînê destpê bûn
emê mîna bilbilan bin
li ser êgir dîlanê vegrin
em nakin çivîkvedan
an nakenin
dilşad jî nabin
lê tenê emê li ser êgir bimeşin
û dema em xemên xwe biweşînin
gîtar mest dibin
de bibhîse yarê ji livliva dilê min
bi baskên çokekî birîndar difirim
ji bona te şoreşa bê radighînim
hesreta min buhaya wê naye pîvandin
sotandina min ne bi êgir bû
an bi çi alavên gurvedanê bû
sotinadina min bi hêsanî
bi çavên ji av û berfê
di nav de çemên cîhanê dicivîn
azadî rê û gulên xwe peyda dike
nanê xwe di destên te de dipêje
û ji çavên te yên xemgîn de
rondikên zarokan derdikevin

## Rizgarbûn

mîna zaroktiyeke veşartî

di bijangên te yên esmerok de

xwe di te de dihêlim
vedenga cotmeha germ

di kendavên gewdeyê te de

berdidim
bê rêbaz

ez melevaniyê dikim

şopa gavê neyzekan didim

ji bo te bibînim
li seriyê rêyan de

di çavên newalê de disekinim
ta şewqa te bihin bikim

mîna awazekî sivik

li ser te dimînim
li ser girên te radibim
volkanê henase dikim
bi hovîtiya pilingekî girêdayî

**bi werîsên te ve**
**ji bedewbûna te yî xweş re**

**berz dibim**
**mîna firişteyekî di nav memikên te de**
**zimîna maçekê distînim**

**mîna xewinekî kûr**

**şiyariyê red dike**
**di nav henasberdanên te de**

**hêdî hêdî diçim**
**davekên xemên xwe**

**girêdayî bi hev ve dihêlim**
**ta stranên rizgarbûnê sirûd bikin**
**mîna kesekî xemê deryayê hêdîka dişopînê**
**mîna moriyekî westiyayî**

**guhdarî şopên tiliyên te dikim**
**dema bi porê te dileyzin**
**mîna ezmên fereh dibim**
**dema te hembêz dikim**
**mîna qurmiçkên ewran belav dibim**
**dema oxiriyê ji te dixwazim**

## Şahiya winda

Ji evînê re

cîhana wê ya têkçûyî

mîna xewina me ya jibîrbûyî

di talîzoka kûrahiyê de

ji evînê re

cîhana wê ya girs

mîna nîgaşên deryayê

mîna berfa qelew

wekî tunebûnê û dengê wî ya kalbûyî

penaberbûyî

ji evînê re şoreşên qirecirê

li şanoya birh û mijangan

û rêya dirêj

ji evînê re

gîtarekî ji vedengê re

xwe dixemilîne

çirûska agirekî

**xwe ji tariyê re rût dike**

**paş robaran**

**emê hev bibînin**

**toza dûrbûnê li ser eniya hevdû**

**jê bibin**

**kûsteka birînê bibirin**

**nav azana pirsê de**

**sozên zengarî**

**ayetên hevdîtinê**

**ji mirinê re dixwînin**

**sêwirên me ji dûr ve dibînin**

**li ser robaran**

**kevok ji jûr ve**

**binefşan dibarînin**

**awazên ewran**

**difirînin**

**çendîn awaz**

**bi xweziyan avis e**

**li ber siha êgir de**

**perwînên sipî**

**xwe bi hêsirên me dişon**

**dikevin xefkên pîzotê**

**xwe dispêrin aliyên mest**

**sîtav jî bi sûlafê re**

**dikeve rikberî**

**li porê te yî zîrên**

**di ferhenga bedewbûnê de digere**

**roj paş xwe çi vedişêre**

**agir jî nameyên evîna me**

**dihêre**

**li vir**

**şermbûn li ser tovên jibîrkirinê**

**ava kîna xwe rijand**

**xemgîniyan li ser bilûrên şivanan**

**daweşand**

**bawişkên berbangê**

**têne min**

**dema ku di nav memikên te de**

**xwe vedughêzînim**

**tembûr xwe bi werîsê mey**

**digerîne**

**kovanan ji hinavê maçan**

**derdixîne**

**wateyên peyvên**

**giran dikelîne**

**giriyê digrîne**

**xwînçûyîna min li ber bê**

**serî hildide**

**rengê sor**

**li ser asîmanan**

**belav dike**

**paş tariyê**

**ezê mîna bilûrê**

**ji lêvê xeman**

**têr bibim**

**di hembêza nalînê de**

**kevokên gûzel kedî bikim**

**berxikên berêvarê diçêrînim**

**stranên lerzok careke din**

**li ser çem û zeytûnan xuya dibin**

**çavê xwe  li ser kuştina şahiyê vedikin**

**di gavê gêjbûna dawî de**

**mîna xewinê dinalim**

**li bilindiyê de**

**xwe dispêrim sîperan**

**kurdistan**

**bilindî bi te dikeve**

**tenahî cil û bergê te ye**

**sêwîbûn rengê gelê te ye**

**ronahî û malbetên tîrêjan**

**xwe di te de bicih dikin**

**li ber kenarên penaberiyê de**

**nûbedarên xwe bi rêve dibin**

**wê rojekê ew seqem**

**li ser sînorên welêt de**

**bişke**

sexte jî wê were

sêdar kirin

qurmiçkên tozê wê binax bibin

eniya volkanên nû

wê carek e din çalak bibin

ey dêma cîgehê

xwe veşêre di gewriya felekê de

ronahî çarmîxkirî ye di gewdeha tariyê de

ba jî çîroka windayekiye

li warê me de

de bijî ey çirûsk

bibe pêl  û rok

rava bike felsefeya kaniyan

dema diherikin

li ser damarên deşt û zozanan

werin xwzayîno

ji hêsir û helbest û zemîna dîlgirtî re

bilêta şahiyê bikirin

## Şerxûşî

**Ewr ronî dide**
**nalîna xwe ya xunavî**

**bi goman  û şikestin rûdike**
**ezê komeka hovîtiya rêwîbûnê belav bikim**
**ezmana te bi nivişte**
**ey sêdarkiriyê**
**dirêjkiriyê li beyderên baranan**

**ferehiya zembelê**

**êrîşê  gewdeyê pîrekê dike**

**xwepereste bi evîna xwe**

**li ser kenarê xurtekî dîn**

**şevdaniyê dike**

**xwe bi xweziyên rengîn dipêçe**

**tayek**

**gewdeya wê**

**talan dike**

**dara biyê li ser kenarên tazîbûna wê**

**zer dibe**

**kefen li memikên wê digere**

**lêvê xwe li ser lêvê wê dibrêje**

**ewê dîn jî**

**çîroka tunebûnê di kuxika wê de**

**berçav dike**

**hêdî hêdî dinale**

**bi jîrbûna bîrnasan ve diçe**

**payîz bi ewrên wê yên pêncî dirame**

**ji lêvên te xweştirîn**

**ew hingiva ronî di çavên te de**

**ji sipîbûna gewdeya te ciwantir**

**ew berfa sar e li bilindiyê bêvilbilindiya te de**

**çendîn di min de dijî**

## Sîmfoniya kotre kûvî

di tariyekê de
ku hindik ma bû
asoyê daqurtîne
 min leylana te dît
şeva min dixwar
 xewinekî dikim sirûd
ku ji sêwirên min peqî
 gemiyên bîrêkirinê

di hizrê min de
 derbas dibin
di şanoya felekê de
xemgîniyekî rê disotîne
raman di min de

wekî evîndarekê rêwî diçe
 tîp jî nav ristê min de
 hember qirkirn, zordarî

û agirpêjiyê radiweste
 berbanga xwe kuştî dibînim
li ser pişta hêvaronê de
 ey welatê min
min serdema tirsê tewandiye

**ji ber vê jî**
**gul û ciwantî**

**mîna kanî di peyvan de difûre**
**stranên dilêş**
**min dorpêç dikin**
**hevokên pênosê**
**xwe bi min digerînin**
**gustîlka nîgaşan**

**xelatî min dikin**
**min ji şikeftên tunebûnê derdixînin**
**gelo ez siha asîman im**
**an pergalê xemsariyê me**
**an jî dola poşmaniyê me**

**peyvê min li xwe dike**
**laşê deryayê elesan hembêz dike**
**ji çîrûska rehniya xemgîn re**
**ji şevan re distrim**
**awazan dihejînim**

## Sirûda dawî

di aliyan de

çarenivîsên xwe vala dişopînim

dimeşim

rastî başûr têm

min berve bakûr dibe

berketiyê min bikartîne

asoyên xewinên ketî li xwe dike

bêdengiya min

windabûye di nav tariyê de

di evîneke serxweş de

qêrînên min xwe bidarve kiribûn

di rêyan de mîna moriyên binkeftî dimeşiyan

genimê lawaz bê omîdî

bi tenê dihêrin

di te de sibehên tîrêjan

hatin e veşartin

li berêvarê de biryar dan

**ku biçin cem kendavên şiyarbûyî**

**ez hogirê dengê te me**

**di tariyê de**

**ey mîra êşegan**

**tu matmayîbûnek e mezinî**

**bi qasî peyalan**

**de bimeşe**

**aramiya xwe hilkişîne**

**şala leylanê li xwe bike**

**tu tirsek e sivikî**

**di hundirê min de**

**hogirê giyanê te bûm**

**di şeva bêdengiya lezgîn de**

**li ber te bûm peykerekî**

**de lêvên xwe**

**bi germbûn berve min bêne**

**di van kêlîkan de**

**em dijîn**

**lêgerîna metirsiyan neke**

**ey nermbûna nêrgiza xwînçûyî**

**lêgerîna siha demê neke**

**gulên me hîn neçilmîsîn**

**di nav de**

**ew baxa şîn û penaber e**

**xwe germ dike**

**tenê xwe bi dilxirabiyê**

**binax neke**

**têkeve ferhenga barana bi merhemt**

**pey awaza xemgîn nekeve**

**nalîn nebe**

**rojhilatiya min**

**ji ber ku ez birûskekî bê baran im**

**ez e timî**

**di nav êzinga şilbûyî de**

**xwe bispêrim**

**di nav qurzîkan de**

**bi rengekî virmûr xwe hilînim**

**li ser quman**

mîna mişextan

xwe bimrînim

bi tenê tovên hêviyê biçînim

êşa melol

di agirê kenê te de

vemrînim

di wan aliyên vala de

ezê kovanan bigrînim

li ser rêyan de

têkevim tûrê şevan de

berve bedewbûna avê bimeşim

nîşanan

di tariyê de

şêwe bikim

pey sûlavan herim

çavdêriya çemên

di çavên te de bikim

çavdêriya riwên te yên hingivî bikim

nîgaşan li ser gerdena te

bikirim û bifrûşim

bi buhaya maçekê

hevdîtinên me kal bûn

deziyên wan

li derziyên niyaziyê digerin

de lêvê xwe bide min

emê her tiştî paş xwe bihêlin

maçên me sinc in

kelehên dildariyê ne

beranberî berêvarê

tevî ku talanbûn heye emê biqêrin

birînên xwe bicivînin

di van kêlîkan de

emê herin

dûr.. dûr

heta xala dawî di gerdûnê de

emê bibezin

qet tu newestiyayî

ji ber giyan li ser çema bi çûk de

**mîna gemiyekê ye**

**ji çûyinekê re**

**xwe amedekirî ye**

**de derbas bibe**

**di kovanê min de**

**û bêhinvedanekî**

**di xwîna min de bistîne**

**em pêlên evînê ne**

**di feleka mij û moranê de**

**û em ahînên hemû huneran in**

**xemgîn nebe**

**ji ber hîn rehjena te**

**metirsiyeke ji xemgîniyê re**

**û ji êşa dijmin re**

**hîn findên me venemrîn**

**bihêle mey**

**li ser lêvê me de**

**xemên min vexwe**

**bihêle peyalan**

**di xwîna te de gemiyan bigrin**

**ji bo li ser mestbûna min de**

**biçin**

**êşa demsalan ,qeyrana min bêjin**

**li ser maçên me ên bapîr biaxivin**

**dema li ber deryayekê**

**me gunehên xwe**

**bi hêsir û hembêz dişuştin**

**bîrêkirna xwe bi min de**

**ev sirûda min e herî dawî ye**

**piştî wê gemiyên min qet êdî nayên**

**bihêle volkanên min**

**li ser xwe mikûr bibin**

## Sirûda neamedebûnê

**Di neamedebûnekê de**

**di nav qurzîkên sêwirê de**

**çibûm li xwe bigerim**

**mîna geştiyarekî**

**di hembêza ronahiyê de**

**li xwe digerim**

**êşên dûmahîkê dibînim**

**şînbûnekê ji xemê dirêjî vedengê dikim**

**pistepistên cih dinivîs im**

**maçên min di xwe de Pencemûr dike**

**nanek ji ewr**

**mûkêtek gîha**

**solavek dîdarî**

**xwe dirêjî min dikin**

**ne şewqek ji dûr ve**

**ne jî hogirekî**

**çirûskek jî**

**ji reşbûnê kil derneket**

## Şivanê kerî

**Kerî dû kerî bang kirin  li ber derî**

**bi navê serok, rakirin ew serî**

**nexweşî û nezanî dirûşma jiyanek**

**hemî xewin û hêvî di nav de firî**

**demukrasî xewin e mîna wekhevî**

**gelo kî ji dest me welat tev birî**

**belengazî têde bi girsî dijî**

**ronakbîrî  di nav de evînek mirî**

**ji derveyî dema îro em dijîn**

**di çarçovê êş û xeman û girî**

**dihêrin sloganê pûç û derew**

**bila her bimîne şivanê kerî**

## Şoreşa evîndarekê

xwe veneşêre ji şermiyê

were bilindiyê

li ser herdû memikên min de

wekî hovekî dijwar hilkişe

li çavê min meyzeke

asîmanê xelatî te dike

çi dibînî?

birînên kevinar dişopînî

herdû çavên te nîvê arandina min e

destê te li ser rehnên min

dojeha şoreşger tev dide

lêvên min bi maçeke rasterast dehille

li ser sîngê te dixwişe

rêwî diçe

bar dike

evîn ji aramiya mêyatiya min derbas dibe

ronî wek rêwiyekî

**li ser gewdeya min her diçe**

**ez im Enahîta**

**Eştara**

**ku dijî serdemên kevinar**

**serî hilda**

**dildarîbûn li ser gewdeya min de**

**rojbûn bû**

**min tevna mêyatiyê**

**li ser jiyana derbider gerandibû**
**xwedayê nêr jî**

**ji malzarokê min derketibû**

**ji wê demê ve**

**serdema nêrîtiyê destpê bû**

## Stranên beybûnê

**payîz di çavên te de**

**zîndan dikim**

**ta ku neyê**

**bi ewran**

**şa dibim**

**ta zengilê lêdin**

**westiyayî me ez**

**mîna dilê xwe**

**wek cîhana şilîbûyî**

**wek ew serên xwîn jê tên**

**di bîranîna dehê miheremê de**

**ez ew xêza  di nîva gokzemînê de me**

**gerestêrêkên kesera adamîzadê nîvî dike**

**ez ne wek eza xwe me**

**sadeyî bi zelalî dixe**

**û ne ew eza ku dibe**

**husteyê şaşîtiyan**

**eza min e rasteqîne**

**bi tenê êşê dikşîne**

**paş naverokên tiştan**

**tenê tu di damarê min de yî**

**niha derbas dibî**

**bê ku rih te bibîne**

**ji bilî rebenan**

**bi pakiyê meşê xwe dişoyî**

**nimêjên evînê**

**jorî merdiya deryayan**

**lidardixînî**

**tenê tu maye ji zelaliya sêwiran**

**di qerebalixê te de**

**mîna leylanek e çargûşeyî**

**derbas dibim**

**zemawenda aliyan**

**çavdêr dikim**

**neqşeyên bê**

**berve me tên**

**ta me di tariyê de**

**binivîsin**

**ta bibin du find**

**an du çerçevên bi yasemînê**

**baxkirî**

**bi evîna xwe**

**banga perwînan dikin**

**mîna du gerestêkên**

**li asîmanê hevdû dibînin**

**hêbetkirinan didzin**

**guhdarî dengên ên bilbil afirandine dikin**

**û hingiva maçan**

**ji mêşê hingivê lêvan**

**derketî çêj dikin**

**awaza te seyra sîmfoniyan e**

**dema rojbûnên zimanan**

**kurtas dikin**

**de bimeş e mîna evîndarekê**

**li ser pirên tenahiya min de**

**mîna qereçiyekê**

**sema wê westandibû**

**temar jî**

**wê bê rewş kiribû**

**xwe li ser bijangên rêyan**

**dirêj bike**

**ta di te de ew mij rêwî be**

**li deştê ewran de**

**ta gulîstana baranê**

**ezê komeka dawî binivîsim**

**ji bo gulya gîhayê baniyan**

**te mîna nivişţkarên deryayê**

**rajim**

**mîna birûska bîrêkirinê hembêz bikim**

**bi birçîbûnê dergeh û pencereyan**

**ji lêdana tiliyên evîndar re**

**ta nalîn raze**

**û stranên beybûnê**

**pêş ayetên berbangê**

**serîhildin**

## Tewişîna evîndarekê

bi destê xwe

min te ji derveyî jiyanê

surgûn kir

ta tu bûyî

ew nalîn

çûkê min

ligel te min evîn wekî pîzotê

bilêv kir

mirina te di jiyana xwe de

wek e jiyanekê hilgirt

evîna te min dibir

jiyana xirênê

li ser kendalekî

dikevim xewê

bi hêsirên li ser palgehê xwe de

diramim

ez hîn temam nebûm

**mîna êşek e evînî**

**netemam bûyî**

**di nav te û mirinê de**

**dudilim**

**fêrî bijartina leylanê dibim**

**ey temenê min e di nav mij de**

**dorpêçkirî**

**di nav min de**

**tu mîna xweliyê yî**

**û peykerekî paxirî**

**rawestyayî**

**xewinên te jî bûn xwînçûyîneke**

**dûrbûnê rêz dikin**

**qeyrana evînê**

**di çavên te de**

**min parçe dikin**

**min bawer nekir**

**ku evîn bibe dergûşekî**

**di wêranbûna xewinê me de**

**di rojekê mîna her rojan de**

**wekî vê rojê**

**nûçeyên evîna te yî tewş dibêjim**

**bi xwîna rondikan jî**

**bê şerm pêş bê**

**çavan kil dikim**

**çavên te ey dawiya xewinê**

**du pencere ne**

**li ber dêmê beyaran de**

**mezinayî evîna te**

**hildigrim**

**an mezinayî ya te**

**bi riwê te yî bû mîna rê**

**û berêvarê**

## Tîpa  pîzotê

**Ji tîpên min ve**

**elesa bêdengiyê diçe**
**mîna kaniyekî**
**di tîpa sirûdgotinekê de dirije**
**bûme pîzotekî**

**di nav xwe de**

**êşan dibrêje**
**bi xemgînî**

**di çirûska bê xew de**

**vedişêre**
**min zêde teysîn bike**
**ey heyva ku bûye**
**mîna zîndanekî teng**
**di dilê min de**
**ey heyva evînê**

**ji ber tu a minî**
**te daxwaz dikim**
**ji bo dilê min e têhnbûyî**

**sirûd bikî**
**min ronahiyê winda kiribû**
**ji dema ku min**

**jê hez kirbû**
**çendîn ew mîna serbiran sert e**
**wisa jî min wê nas kiribû**
**li vir li ser rêyên mala yara min**
**min rojbûn û zaroktiya xwe ragihand**
**ji bo wê van helbestên min**

**xwe ditewînin**
**tîpên min bang didin**
**li ser sîngê bedewbûna wê de**

**stêrkekim**
**di şewqa wê de**

**tavikên welatê min ronî dibin**
**min xema felekê**
**bi bîrêkirina xwe de**
**rizgar kiribû**
**min wekî pîzot û agirê xweliyê**
**bi lêv kiribû**
**di nav helbestên xwe de**
**ava kiribû**
**li serê nivîştê**
**li ser hibirdanka xwe de**

**bilind kiribû**
**ji ber vê jî**

**ligel ronahiyê**
**wekî serwerkî**

**jidayik bûm**
**kelehên dildariyê**

**bi xebata xwe**
**ava dikim**
**erd bi hevgirtina evînê**
**di rehjenên me de**
**di cîhana nakokiyan de**
**jiyan dike**
**yekîtiya evîndaran**
**mezintirîn helbest e**
**mîrnişînên kînan dihejîne**
**mirovatiya mirov**

**daxwaz dikim**
**ji bo bi xuristî jiyan bike**
**her reşiyê ronavêj bike**
**dîrok sîngê xwe rojekê**

**ji evîndaran re venekir**
**ji bo xelasiyê armanc bike**
**lê belê her timî**

**bi talbûn derbas dibû**
**ji bo yên wendayî re**

**dûrgeh dibû**
**kanî bi kurahiya asoyê**
**li ser her wêranbûnê**

**her hişkê diaxive**
**li ser xeyda me**

**a ku di nav rehjenan de**
**bi cih bû ye**
**windabûna me**

**di talîzokê bêbextan de**
**ez ji êşan re şoreşekim**
**ji evîndaran re**
**rêberek im**
**wê bibe ew evîn**

**gewretirîn şoreş**
**jê re jiyan bi her rikberî**

**sirûd bike**
**ez alîgirê evînê me**

**di dema tarîbûnê de**
**dijberê efsanên bapîran im**
**daxwazê cîvakeke**

**nerîn sirûştî dikim**
**di nav de**
**emê xewina her bangdayekî**

**pêkbînin**

## Xewineke bazdayî

**Hêsireke di herdû çavên wê de**

**tîrêja êgir di kûxika birînan de**

**pêxist**

**tenikbûna Bax û Ewran**

**li xwe kir**

**kaniyeke sîberkirî  di sibehê de**

**bûmbe kir**

**dengê wê bi çemê sazbend re**

**herikî**

**porê wê  ya şevtarî**

**xwe tevlî bê dikir**

**ez di şikefta çîrokan**

**bi cih bûm e**

**Şopê xewinê**

**di newalê beybûnê didim**

## Xirên

**Min bi destê xwe ve**

**kilîta bêdengiya te çekir**

**Şerbeta lêdeçûna xwe yî serveçûyî**

**vedixwî**

**bê ku geregiya te bi min hebe**

**asêyî tu**

**mîna têlên zeviyê**

**li çi dinêrî!?**

**ey êşa zengelorên xwînçûyî**

**ev barana kesk**

**di xwîna min de ye**

**evîna min werdigerîne**

**kêlîkek hembêzkirin**

**bin sihwanê  ewran de**

**du fîncanên ji poşmaniyê**

**li qehwexaneya yek ji qurîzkan**

**du maçên giran**

**li ber dergehê**

**du cakêtên şilbûyî**

**bi pistepistên du evîndaran**

**dilê xwe hiştin li cem hev**

**mîna me**

**hêsirên xwe li cem hevdû**

**jibîr kirin**

**de were ku em bêvila demê**

**bi derbasbûna çerxan ve**

**bi awazê bidrûn**

**dûrî nalîna berdewam**

**mîna tirênê**

**te aliyên min**

**winda kirin**

**boriyên me neşikestin**

**wax ey mîra damarên qutbûyî**

**çawa felek**

**buxîra kenên me**

**ritmên maçên me**

**û qirecirên gewdeyê**

**jibîr kir!**

**di nav dengê te**

**û dilopên xunava hevgeryayî**

**li ser lêvê te**

**ev buhara ye**

**û di navbera kevok û çûk de**

**siha te yî rawestyayî**

**di nav wan de**

**ta  bê ling**

**li deverên  qeşayê  digere**

**mîna şeydayekî**

**kîna xwe li ser dema borî de**

**hildigrim**

**li pey leylana te dikevim**

**lê tu a şaşbû ye**

**min dilê xwe  li ser rêya te de**

**winda kir**

**kî wê qêrînên min e destpêkê**

**vegerîne**

**asîmanek e di hundirê min de dimeşe**

**mîna agirberdanê**

**sermayê vêdixînim**

**petîla sîngê xwe li ber riwê berfê de vêdixînim**

**xwe tevlî rûnivînên baranê**

**sehnên heyvê**

**kevçikên wê yên sar dikim**

**rê ji min bazdide**

**mîna memikek talanker**

**di navberê sindanên lêvan de**

**xwe vediguhêzîne**

## Xwedan Çavên hingivî

**Ey xwedan çavên hingivî**

**tu tabloyekî**

**helbesta min nîgara min e**

**ez şêwe dikim**

**ey xwedan çavên hingivî**

**tu dûmahiyî**

**êvar di çavên te de**

**mezin û kal dibe**

**lêvên te di demsala buharê de**

**bîtanokin**

**di giyanê min de**

**hinarokên te bişkoj in**

**awaza dengê te**

**komeka baranê ye**

**li ser camê diraze**

**xema min şêwe dike**

**bajarên biyan**

**di çavên te de ne**

**ez li welat û nasnameya xwe digerim**

**çavên te welatê her dilekî**

**bi evîn e**

**min evînê di zimanê xwe de danî**

**ji çavên te de**

**hemû elfeba ferhengek e**

**ji serdema – Gelgamişê- de**

**ez mişext dibûm**

**-Eştar - min nas dike**

**her timî vedişêre**

**-Enkîdo – min dinase**

**-Sêzîfa – gênc jî**

**-Neyrûn – min disojîne**

**û – Roma – sûd digre**

**welatê min çiyan e**

**Landika min agirên bilidiyê ne**

**evîn jî destaneke**

**dev wê dûbar dike**

**ez di deryaya çavên te de deryavanî dikim**

**deryaya wê naqede**

**pêlên wê xwe dihejînin**

**dilê min di çavên te de**

**baxê geliyê li xwe kiribû**

**zaroktiya min**

**di hundirê min de**

**pêş dikeve**

**min du cencer didîtin**

**di dûmahiyê de difirin**

**di çavên te de cencer**

**bi evînî xweşecanî dibin**

**û xewinên milyonên**

**ên bahoz êrîşî wan dike paşve naçin**

**stêrkên min e rijî**

**bi evîna xwe**

**hevdû hembêz dikin**

**li vir di gemiyeke tarûmarbûyî de.**

**ew Ferat çendîn ji çavên te de**

**lehî dibe**

**ey çiyayîya xeman**

**xemên te dagirtî ne**

**ez bi çavan**

**şeyda me**

**binyad im**

**ne her kesê**

**çavan hezkirî ye dildar e**

**ne her darqesebkî**

**ji dirêjî xwe hez dike**

**ne her dilekî poşman û stîxwar e**

**di ferehiya çavên te de**

**ez rûndikim**

**di her adarê de**

**hevala min te dibîn im**

**mîna bizqekî birîna xwe**

**diteqîne**

**girnijîn dibe**

**bi êşên berfan û evîna wan**

**ji ber diaxivim**

**û dimeşim**

**dojeha qels li pey min tê**

**nivişt di çavên te de**

**bi bedewbûn bang dide**

**rakêşan jî di nav de dizivire**

**tenê çavên te**

**cîhaneke bê êş hildigre**

**wisa ez guman dikim**

**xema min**

**ne me guhdarvan e**

**lê şoreşvan e**

**ey keça min**

**xema min ne dilovan e**

**bi qestkirina te ji destê min re**

**wekî gulekî dirazim**

**rondikên min zûha dibin**

**bişkoj jî dicivilin**

**destê te yê nazik**

**birîna hilmê qest kirin**

**bûn kaniyekî-**

**di nav de – zemzem e**

**çavên te pencereya nalînê ye**

**ji ciwaniyê re**

**cihekî aram e û nemir e**

**qet tune nabe**

**cîgeha giyanê rebenan teva ye**

**sirûda wan e**

**seqayên nivişta te di wan de ye**

**-Sîpan – - Agirî û Cûdî**

**di xwîna min de ne**

**di her serdemê de**

**kovana min pirsyar dike**

**di her birînekî kevinar de**

**birînek min heye**

**kelehên evîna min hemî – Demdem –in**

**Eştar ma tu nemirî bi xwe yî**

**dawiya min**

**mîna  vê helbestê**

**hat e qedandin**

## Yara min û qefesê

**Herdû sêvên te yên esmerok**

**lêv û maçên hevxelek dihelînin**

**pirsên min in vekirî diqelînin**

**paş cilek tenik û teng de**

**xwe tevlî hev dikin**

**rengsor e**

**bi maç û tiliyên min**

**sermest e**

**birçîbûna bedewbûnê veneşêre**

**nexe di nav kelepçeyan de**

**ma ew tû yî a dengê dil**

**li ser xêzan qewirand**

**dema min tîpan**

**berve sêwirên xwe ve**

**şêwe kiribû**

**min mezinayî**

**ji evînê hilgirt**

**azadiya min**

**di nav bedewbûna kujer e**

**dengê bîrêkirina xwe**

**veneşêre**

**Pistepist bike**

**axdariya xwe**

**ji qêrîna zûha**

**dirêj bike**

**zendên xwe ji ezmên re veke**

**mîna çivîkekê li ser bên difire**

**bi nivişta xwe cîhana nezaniyê**

**red bike**

**ewê ku me bi êşa girs**

**êrîş dike**

## Yeqîn

**Di te de dînîtî**

**dev ji taybetmendiyên**

**xwe berdide**

**û yeqîna ne hatiye afirandin**

**jêdibe**

**nîva te deryaye**

**û nîva te ya din jî**

**ew zivistana ye**

**hinek lêvê min**

**di penaberiyan de**

**hatin xwar in**

**û bermayên wê jî**

**êşa evînê dibînin**

**min heyvekî**

**an birûskekî**

**bilêv bike**

**di te de balindeyên qulingan**

**şiyar bûn e**

**û li cem memikên te de**

**firînên xwe**

**bi dawî kirine**

**min ji kaniya erzê**

**bike cokekî**

**û min mîna durê derxîne**

**dengê te**

**li derbasgehên min de**

**qerebalixê dike**

**ji bûna te birîn**

**dev ji birîna xwe**

**berdide**

**devlokir jî awaza xwe**

**di destpêka davekê de**

**jibîr dike**

**vedeng jî**

**paş sînorê bedengiyê**

**vedikişe**

**pistepista barana xweştam**

**li ser konê min**

**bi nermî**

**bi min re dipeyive**

**bê ku ez tiliyê xwe**

**di amanên avê xim**

**ji bo ez hinekî**

**jibîr bikim**

**an bi giraniya dilê xwe**

**hinekî hest bibim**

**serma**

**mîna destpêka penaberiyê ye**

**ez mîna heyecana evînê**

**li ser lêvê kurtekî ji agir**

**xwe vedughêzînim**

**ne tiştek li dev min heye**

**ji bilî devê min e ku bixûrên xwe**

**li kolanên sermayê de**

**belav dike**

**êşa hacîreşkê**

**ji min kême**

**ta zêdetir**

**buhara te fêr bibim**

**êşa darê hejîrê**

**ji min kême**

**ta ku ez zanistên zikmakiyê di te de**

**fêr bibim**

**di du romanan ji zivistan û cengê**

**li ser aliyên bêdengiyê**

**û xewinên te de derbas dibim**

**ahîn dû ahîn li ser xemê te**

**nûçeyekî ji min re**

**dibêjin**

**rawestiyayî dirazim**

**cîhanekî gemirî**

**mîna celb û cenaqên rêyan**

**li kampeyan de**

**tekerên bi rengê axê ne**

**xelk bi lez diçin**

**dil kumên sermayê li xwe dikirin**

**dêmên ezmanî ne**

**baran e**

**baran**

**ne ezman li jor me de ye**

**û ne jî maç**

## Zaroka sosinê

**lêvên te**

**birîna min e çêjdar û zelal e**

**û memikên te**

**cîgeha devlokira min e tirsdar e**

**ji ber verecfînên me**

**nivîn dihele**

**di ahenga dilpijûkiyê de**

**tilîlî dide**

**li ser gewdeyeke sipî de mîna berfan**

**li ser  çiyayên wê de**

**ala min diheje**

**di nîvên te de**

**jîndar serî hildidin**

**vedengên zarokekî har hildigrin**

**di nav de**

**xwe hildidim**

**dadikevim**

**sirûdên me ji hebûnê re**

**çavkanî ne**

**seqem li ser pişa min**

**dimeşiya**

**ey roka hemî birînan**

**hilat bibe**

**ey baxa ji leylanên avê**

**nermîna min**

**zaroka sosinê**

# Zayîn e an Raperîn e

**Dildariya min sirûd in**

**pirtûkên pîroz in**

**tên rêxistin**

**berhevkirin**

**ji bona te ey dilê min**

**ez e gerdûnekî biafirînim**

**têde xwezî**

**piştî bendemaniyekê**

**avis bibin**

**va evîn ji nû ve vegeriya**

**peyalên mest li dûr te ve**

**xwe radikşînin**

**hembêza te seyran e**

**gurmijên lêvên te robar in**

**memikên te lehiye**

**merq har e**

**dîn e**

**lêvê te gulav e**

**porê te zêrîn e**

**seqem bi hêrs û kîn e**

**destên min birçîne**

**henasên min tî ne**

**pelên daran li ser dirêjî gewdeya te**

**çendîn gulgulî ne**

**zozaneke şîn e**

**me razan bi te re**

**zayîn e**

**an Raperîn e!?**

## vedengên dilsariyê

**Welatekî ji qerebalixa azariyê**

**xuya kir**
**li ser dirêjahiya jiyanê**

**xwe rêdixe**
**salê di hinavê mij de vedişêre**
**nalînê disûjîne**
**di devê awazekê de**

**hêsirên pepûkan didûşe**
**pîzota kelî**

**ji destê xweliyê radije**
**di şikefta bêhêviyê radize**
**di xelekên êgir de dimîne**
**welatekî bûz e**

**stûxwar e**

**li bin lingên zordaran e**
**ne qêrîn dike**
**ne destûr xwest ku bar bike**
**mirina wî bi navnîşan e**
**di ahînên ew kesên koçkirî de berz e**
**ên di kelekela nîvê rojan de**

**rêwî dimînin**
**di ziqaqan de pêxwas digerin**
**dilzariya xwe dikin nan û ax**
**û berve berêvarê diçin**
**ey xilda bêhiş mîna demsalan**
**di xefkê mişextiyê de xwe vedişêrî**
**mîna nexweşiyê xwe ditewînî**
**bi qêrîneke jibîrbûyî**
**ji bêhêviyê re tu hogirî**
**korî mîna wî**
**çavên te yên kirêt**
**rastiya jiyanê ne**
**mizgînî sexte ye**
**evîn jî nepenî ye**
**belavkerê pepûkiya giran**
**ji te re kirêtî xwe ditewîne**
**bîranînan dadeleqîne**

**ev zimîn ji êşa xwe qêriya**
**di riwên bê xwediyan de**

**dengan bavêjin**

**peyvan dûbare bikin**
**yên ku ji dil derdikevin**
**ji kûrahiya çiyan û kaniyan tên**
**nalîna me ji bilindiyê re ye**
**li wir penaber dijîn**
**bingeha abcediyetê ava dikin**

**ji kesên ku li xwarê dijîn**
**tiştek ji kêliyên me re neman**
**nezanan cîgehên ramanbûnê dagir kirin**
**elesî ji rojhilatê me re lorand**
**rojhilata xwînçûyînê**
**rojhilata dax û birînê**
**cîgeha parsekcî û padîşahên xwînmij**
**paytexta xencer û xerdelan**
**cihê komkujî û kujeran**
**girî di qirikan de sekinî**

**li beranberî ramana tevlîhev**

**razan bê hiş e**

**dem jî seqet e**

**beranberî gulîstaneke tazî**

**li hember artêşên tozê**

**qêrînên xwe melûlin**

**li ber berbanga sipî**

**tenî li ber bêdengiya sermayê dinale**

**lêvên geşbîn cilên bûkaniyê li xwe dikirin**

**bi rêya maçekê**

**di şikeftên dawiyê de**

**stêrkan dibînin**

**ey kûjerê min**

**di gerdûna bêzariyê de**

**xemgîniyê nekole**

**kûjerê nasnameyê**

**ey kujerê agirpêjiyê**

**min bişopîne**

**derkeve li ser kevîkên girên êşan**

**zinara hêrsê bi xwe re bixuişîne**

**xeman neêşîne**

**ez lat im di xwarê de**

**Sulavê Pêşwaz dikim**

**sîtava te qêrînek e şoreşger e**

**ji lepê wêranbûnê**

**guhertina resen  derxîne**

**de li ser pirên felekan bimeşe rêwiyo**

**ey belavbûyo li ser gerdenê çeman**

**mîna xalên birûskê**

**li ser sîngê çirûskê**

**lêdana kêrê di sîngê min de**

**pîroz bike**

**pîzota evînê vêxe**

**meya hêsiran vexwe**

**li paş bîrêkirinê**

**sengerên hêviyê razayîne**

**lawên bê**

**xwe radestî tengezariya bê hiş û rêgez dikin**

**tilîliyan bifroşin**

**ey nobedarên mirinê**

**nivînên şoreşan**

**wêran bikin**

**peyv li wateyan digerin**

**li beranberî rastiya virnas**

**tên serjêkirin**

**birîn û rêya dûr**

**hevdu digezin**

**cilşuştiyên hevdu**

**radixînin**

**dilsariyê hêvan dikin**

**xemgîniya wêrek**

**binax dikin**

**di min de xem**

**alên avîndariyê diçînin**

**da ku damarên hunerê**

**di vê serdema kirêt de**

**bi hev ve girêdin**

**-Rêber Hebûn (Rêber Adil Ehmed)**



**- Nivîskarekî Kurdistanî ye**

**-Rojbûn: Minbic 02.11.1987**

**Pirtûkên wî yên hatine weşandin:**

**(Qêrînên Roniyê, Helbest bi erebî)**
**( Leylan û Nerîn, Deq û xwendin)**
**Komekên Kurdistanî (Hevbeş)**
**Rêveberê Malxaneya- Kombûna Zanyarên Azad- ya Elektronîk e**

**/https://reberhebun.blogspot.com**

**/https://reberhebun.wordpress.com**

**Email :reber.hebun@gmail.com**

# * Naverok


| | | |
|---|---|---|
| 1 | Diyarî | 4 |
| 2 | pêşgotin | 6 |
| 3 | Hebûn min | 9 |
| 4 | Evîn | 10 |
| 5 | Cejina min | 11 |
| 6 | Vîna nemir | 13 |
| 7 | xewin | 15 |
| 8 | Ji bo vê jînê | 17 |
| 9 | Gor | 19 |
| 10 | Bahoz | 20 |
| 11 | Buhara kurdî | 21 |
| 12 | Destana sirûcê | 22 |
| 13 | Evîna birîndar | 26 |
| 14 | Gulên berbangê | 28 |
| 15 | Pêla zanînê | 29 |
| 16 | Vejîn | 30 |
| 17 | Ji mîra peyvê min re | 31 |

| | | |
|---|---|---|
| 18 | Vedenga komkûjiyê | 33 |
| 19 | Werin | 35 |
| 20 | Lorîn | 36 |
| 21 | Qêrîn | 37 |
| 22 | Peyam | 41 |
| 23 | Barîn birîna giran | 42 |
| 24 | Find û heyv | 45 |
| 25 | Navê min | 47 |
| 26 | Şagirta min | 49 |
| 27 | Hêsirên te | 52 |
| 28 | Dil her tî ye | 53 |
| 29 | Viyana bê dawî | 54 |
| 30 | Ramîn | 57 |
| 31 | Agirê birçî | 60 |
| 32 | Helebçe | 63 |
| 33 | Ahengek mestbûn | 66 |
| 34 | Argûna min | 68 |
| 35 | Bajarên tozê | 69 |
| 36 | Bi vegera te re | 77 |
| 37 | Lutkeya xewnê | 80 |
| 38 | Bixûrbûn | 84 |
| 39 | Çavên te | 86 |

| | | |
|---|---|---|
| 40 | Çêja jiyanê | 89 |
| 41 | Cejina maçan | 91 |
| 42 | cîgeh | 93 |
| 43 | Cîgeha nakokiyan | 95 |
| 44 | Çîroka welatekî | 97 |
| 45 | Di avdarekê de | 98 |
| 46 | Di şeva xedrê de | 101 |
| 47 | Dîlbera gir | 103 |
| 48 | Baran û xerîbiyê | 104 |
| 49 | Dûrbînên xeman | 110 |
| 50 | Eger | 118 |
| 51 | Em gîhan | 121 |
| 52 | Endezyara rewanê min | 127 |
| 53 | Ew | 132 |
| 54 | Şahiya ronedî | 134 |
| 55 | Awaza dînbûnê | 136 |
| 56 | Ez Efrîn im | 138 |
| 57 | Ez û tu | 141 |
| 58 | Gora çokê | 158 |
| 59 | Rojhilat im | 161 |
| 60 | Hêsirên min | 164 |
| 61 | Hêsirên xweziyan | 167 |

| | | |
|---|---|---|
| 62 | Hevala min | 172 |
| 63 | Kenê te | 177 |
| 64 | Keriyên bê | 180 |
| 65 | Li ser kenarên aramiyê | 182 |
| 66 | Mîna davekî | 188 |
| 67 | Nameya hêvî | 191 |
| 68 | Nameyek ji ehmedê xanî re | 193 |
| 69 | Nameyên êgir | 197 |
| 70 | Navnîşanên tagirtinê | 200 |
| 71 | Nîgaş | 202 |
| 72 | Rêwîbûn | 203 |
| 73 | Pêgotin | 205 |
| 74 | Pêla evînê | 208 |
| 75 | Perwîna min | 214 |
| 76 | Pêveçûn | 216 |
| 77 | Qêrînên mêwa | 218 |
| 78 | Qêrînên roniyê | 221 |
| 79 | Rizgarbûn | 223 |
| 80 | Şahiya winda | 225 |
| 81 | Şerxûşî | 231 |
| 82 | Sîmfoniya kotrekûvî | 233 |
| 83 | Sirûda dawî | 235 |

| | | |
|---|---|---|
| 84 | Sirûda neamedebûnê | 242 |
| 85 | Şivanê kerî | 243 |
| 86 | Şoreşa evîndarekê | 244 |
| 87 | Stranên beybûnê | 246 |
| 88 | Tewişîna evîndarekî | 250 |
| 89 | Tîpa pîzotê | 253 |
| 90 | Xewneke bazdayî | 257 |
| 91 | Xirên | 258 |
| 92 | Xwdan çavên hingivî | 262 |
| 93 | Yara min û qefesê | 268 |
| 94 | Yeqîn | 270 |
| 95 | Zaroka sosinê | 275 |
| 96 | Zayîna an raperîn e | 277 |
| 97 | Vedengên dilsariyê | 279 |
| 98 | nasname | 285 |
| 99 | Naverok | 286 |